


AL JİJİ KUŞTINÊ RE KIRİN RESPERDE




G

elê kurd bi deh hezaran li paytexta Tirkîyeyê banga aşti, biratî û wekheviyê kir. Lê rayedarên dewletê bûyereke li derveyî îradeya partiyê, kirin hincet û bi kuştina sê mirovan kampanyayeke nijadperest dan destpêkirin. Tevdîr û plan ji mêj ve hatibû kirin, dixwestin HADEP'ê bigirin. Lewre li dijî hemû cure neheqîyan dengê herî bilind ê girseya HADEP'ê ye. Digel vê yekê rayedarên partiyê wekî di kongreyê de jî diyar bû, biryar dabûn ku ji berê zêdetir piştevaniya kedkarên tirk bikin. Vê yekê di Danezana Encam a Kongreyê de jî cih girtiye. Hewldanên bi vî rengî dewletê zêdetir ditîrsînin.

Röpel 3

- ✓ "Hevalê me DÜZGÜN DENİZ digel Hesenê Halborî ku şervanê Seyid Riza ye, li ser Serhildana Dêrsimê hevpeyvînek pêk anî, "Ji dîrokê re rüpeleke jîndar" Röpel 8-9
- ✓ MAMOSTE DILAWER bi sernavê "Perwerdehiya bi zimanê zikmâkî" li ser girîngiya perwerdehiya bi zimanê dayikê radiweste Röpel 4-5
- ✓ Bîreweriyê İ. OMERÎ yên bi Apê Müsa re didomin, ew bi gotara "Merhaleyên şoreşê û du awayên şoreşgeriyê" li ser rengê şoreşgeriya çepê tîrkan dîtinêñ xwe tîne zimên. Röpel 6

NAVEROK




Li NÇM'ê hewla
nûjenkirina stranê gelêrî

7



Faik Bucak
Sonda mirinê dabû...

11



Bi kurmancî
Mizgîniya Îsa Mesîh

13

Ji Xwendevan


EW KESÊN ku karê Azadiya Welat didin meşandin, em silavên xwe yên şoresgerî ji wan re dişinîn. Bi rastî çiqas mirov nikare bêhilm bijî, xebata bi vî rengî jî bêked nayê meşandin.

Em bi vê yekê bawer in ku, hûn hemû xebatkar bi dil û can ketine bin barê Azadiya Welat. Hûn dixwazin bibin hilma gelé kurd. Armanca we ya iro armanca Apê Mûsa bû. Iro hûn vê armanca birûmet û giranbuha pêk tînin. Em jî di vê riyê de serkeftinê ji we re dixwazin.

MURAT KAYA
GIRTIGEHA BARTINÊ

SERKEFTINA hemû kurdan li xwesiya min diçe. Ji ber vê yekê, du pêşîyazên min jî we re hene. Hûn navê mehan wekî yê MED TV'î bi kar bînîn. Çimkî piraniya gel li MED TV'yê temâse dike, divê ku hûn li dûv MED TV'yê herin. A duyemin jî di zimanê me de hin gotinê erebî, farisî û tirkî hene di her zimanî de wilo ye. Lî belê ku gotinek di zimanê me de hebe, mirov gerek e gotinê zimanê xwe bi kar bîne, yan jî ku peyvek, di zaravayê kurmancî de nebe mirov ji zaravayê zazakî û soranî bi kar bîne, ev yekê zimên zelal bike.

SEYDA RONAHÎ MIRDESÎ



Kongreya HADEP'ê û daxistina alê

MEHMET GEMSİZ

Partiya Demokrasiya Gel (HADEP) kongreyeye mezin, bi coş û şahiye ke nedîti pêk anî. Li Enqereyê, li paytexta komara kemalî, tu partiyen pergalê bi cemawireke wiha kongreyen xwe nikarin pêk bînin û heta niha neanîne jî.

Li vir tiştekî din û girîng jî ev e ku vê partiyê digel hemû çewsandin û pêkutîyan, rîlibergirtin û astengan xwe gihan-diye tevahîya civaka kurd, ew hembêz kiriye û wesfa partiya cemawirê jî heq kiriye.

Daxistina ala tirk, kuştina rîberên partiyê û tevî Serokê Giştî, girtina rîveberên partiyê, divê tev bi vê yekê ve, mirov hilde destê xwe.

Serencama HEP û DEP'ê, ji me tevan re: eskere ye, dek û dolabênu ku dewletê anîbûn serê wan partian, niha dixwaze bîne serê vê partiyê jî.

Serdozgerê Dadgeha Ewletiya Dewletê (DGM) ya Enqereyê Nuh Mete Yüksel daxuyand ku ew jî berê ve li ser HA-

DEP'ê lêpirsîn û vekolînan dîkin. Serdozger bi vê jî namîne cezayê wan jî dibire û dibêje ku HADEP dirêjeya PKK'ê ye; mil û piyekî wê ye. Ev daxuyanî her tişti eskere û zelal dike.

Her çendî di rojevê de "daxistina alê" hebe jî, mebesta hîmî cuda ye. Bi taybetî, bi zanebûn rojeveke çêkirî, rojeveke derewîn hate afirandin. Em li ser daxistina alê ranawestin. Eskere ye ku tu feydeya vê bûyerê ji doza gelê kurd a ji bo azadî û serbestiyê, a ji bo biratî û demokrasiyê re, nîn e. Ev yek ji aliye rîveberên partiyê ve di dema kongreyê de jî hate ziman.

Me got, ku rojeveke derewîn hate afirandin. Berê jî, di kongre, civîn û şahiyan de bûyerên bi vî rengî diqewimîn. Ci di dema HEP û DEP'ê de û ci jî di çalakiyên HADEP'ê de. Tu car ew bûyer wekî vê carê nedihatîn mezinkirin. Mebesten mezinkirina vê bûyerê hene.

Carek, HADEP'ê di hilbijartinan de

çavê pergalê tirsandibû, ji bo ku nehêlin ew bikeye hilbijartînen li pêşîya me, (bi îhtimaleke mezin hilbijartına giştî nêzîk e) dixwazin wê berteraf bikin. Ev yek. Di-do; Pergala kemalî di boranê de ye. Çepelî û gemariya pêşewayen partiyen pergalê êdî nayê nuxamtin. Sicîlîn tevan ne paqij in. Bi vê bûyerê, rojev berevajî kîrin û ew pîstî bindoşek kîrin.

Sisê; Agirbesta PKK'ê ya yekalî hîn jî didome; digel operasyonen îmhaker. Gelê kurd bi vê kongreyê dengê xwe yê aştixwaz li Enqereyê xistê kerika guhê şerxwazan. Vi dengî ew tirsandin. Çar; Kesênu ku hatibûn kongreyê, girêdahîbûna xwe ya bi serokatiya tevgera azadiyê re diyar kîrin. Ev jî li xwesa wan kesan neçû.

Gelê kurd, digel ku ew çend hate pelçiqandin û eşandin jî, gavek, ji doza xwe bi paş ve neavêt. HADEP jî, ji riya xwe avarê nekirin.

Berê der barê HADEP'ê de jixwe xwedî daraz bûn. Rewşa di kongreyê de bû sedemê benkişînê. Komplot temam bû. Daxistina alê tenê pêkerek e. Ne sedema operasyona li dijî HADEP'ê ye.

Di dawiyê de em vê bibejin. Li welatê ku lê aramî nîn e, xizanî, talanî, neheqî û birçitî jî heye, qûtê herî erzan, xurekê herî erzan nîjadperestî û neteweherestî ye.

Di jîyana kurdan de çiya

HAYRETTİN DÜNDAR

Wekî tê zanîn jîyana mir-ovahîye li çiya dest pê kir. Ji ber ku li derveyî çiyan nikaribû xwe bida parastin ji dirindetiya sewalan, ji bandora neyînî ya surîstê mirovan xwe spartin çiyan. Yanê çiya cihê şaristaniya yekemîn e. Her wiha jî ew wekî sembola azadiyê tê zanîn.

Cih û warê kurdan Mezopotamya bi sererd û binirdênu xwe pir dewlemed bû, tim û tim ser vê ceneta dînyayê û warê şaristaniye bûbû navenda şer. Jîber vê yekê gelê kurd, ji bo ku xwe biparêze berê xwe da serê çiyayê asê û bilind. Lewre çiyayê bilind û asê astenga herî mezin li hemberî hêzên biyan; mîna Zaxrosê hêlinâ teyrê baz, çawa ku rê nedabû Îskender. Mirov dikare bibêje destpêka berxwedana gelê kurd di çiya de dest pê kir û iro jî li wir didome.

Tê zanîn, gelê Med ji bo ku xwe ji zilm û zordariya împaratoriya asûr a koledar biparêze bi salan di çiyan de jîyan kirin. Wextê ku êrîşê ser paytexta împaratoriya Asûr a koledar dîkin, Qesra Nînovayê vedigrin û Dehakê zâlimkar dikujin, Mizgîniya azadiyê li se-re çiya bi geşkirina agir pîroz dîkin.

Kesêni li deştan zehftir hatine pişäftin

Belê mirov dikare bibêje, dîrok ji bo gelê kurd qirkirin e, talan e, koçberî,

Lewre kesêni ku xwe nedane çiya, di bin bandora kemalizmê û kapitalizma çelevajî de zehf mane. Ji ber vê yekê jî destpêka şerê çekdarî, ew kesêni di deşt û berûya de ji rîhê xwe û welatparêzi, têkoşîn û berpwedanê dûr ketibûn.

zilm û zordarî ye. Eger gelê kurd heta iro li ser piyan mane, çand kevneshop û perengiyen xwe heyâ roja iro anîne, ev jî bi saya çiyayê Kurdistanê yên. bilind û asê ye. Di dîroka gelê kurd de kesêni di deşt û berûya de jîyane, rastî qirkirîn û pişäftinê hatine û koçber bûne. Deşt û berûyen Kurdistan hê jî pir xweş, germ û fireh in. Bes mixabin ne wekî çiya û zozanê Şerefîn, Agîrî, Sîpan, Herekol û Fereşînê ne. Lewre kesêni ku xwe nedane çiya, di bin bandora kemalizmê û kapitalizma çelevajî de zehf mane. Ji ber vê yekê jî heta destpêka şerê çekdarî, ew kesêni di deşt û berûyan de ji rîhê welatparêzi, têkoşîn û berxwedanê dûr ketibûn.

Tevgera azadiyê çiya kîrin bargeh


Dema tevgera azadiyê derket, pêşî dîroka Kurdistanê di ber çavan derbas-kir. Pişî lêkolîn û lêgerîneke zanistî rîexistineke nûjen ava kir!

Vê girîngîya çiya di dîroka gelê kurd de dît û di destpêka de hemû plan û programen xwe ji bo welatekî serbixe û azad çekir. Pişî re jî çiyayê Kurdistanê ji bo şerê gerîla kîrin bargeh. Belê, wekî me li jor anî ziman, di dîrokê de çiya tîm û tim kurd parastine û lê bûye xwedî. Lî vê carê, ev parastin û

Çiya bûne hêlinâ internasyonalîzmê

Her ku ew şerê gerîla li şerê çiya di dome, kesaniya berê ya kevneperekî û lawaz dişikî û di cihê wê de, kesaniyeke nûjen, hemdem û sosyalist ava dibe. Divê bê gotin ku ew şerê çekdarî ne tê-nen şerekî neteweyiye jî. Ew çiqas nete-weyî be, ew qas jî çinî ye û ala sosyalîzma zanistî bilind dike. Dîsa roja iro çiyayê Kurdistanê bûne mîna hêlinâ internasyonalîzmê. Di nava di hembêza çiyayê Kurdistanê de bi hezaran kesen ku ne kurd in jî hene.

Têkoşîna rizgariya netewî iro hatiye merhaleya serfiraziyê. Lewre ew ala ku sosyalîzma zanistî û internasyonalîzmê li ser çiyayê Kurdistanê li ba dibe. Çiyayê Kurdistanê ji gelên Rojhilatê Navîn û hemû gelên bindest re bûne hêvî û rojîn tarî re bûye xetere.



SEROKWEZRE Yewnanistanê yê berê û Serokê Partiya PA-SOK'ê Andreas Papendre roja 24'ê pûşperê çû ser dilovanjya xwe. Ji bo naştina wî roja 26'ê pûşperê merasîmek li Dêra Metropola Atînayê hate lidarxistin. Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya û Serokê Komîteyê Rêveber ê PKDW'ê Zübeyir Aydar jî di protokolê de cih girtin. Her wiha Rêxistina ERNK'ê şaxa Ewrûpayê jî bi mesajê kî serxweşî da gelê yewnanî.

Li hêla din ji rayedarên dewleta tirk jî Wezîrê Karê Derve Emre Gönensay û Serokê SHP'ê yê berê Erdal İnönü besdari merasîmê bûn. Di merasîmê de ERNK jî bi çelengeke kulîkkan ve besdâr bû.



SEROKA Koma Keskan a Parlementoya Ewrûpayê Claudia Roth da zanîn ku dilê Tirkîyeyê tune ye di warê demokrasiyê de tu gavan biavêje. Roja 26'ê pûşperê di rojnameya Yeni Yüzyılê de hevpeyînbi Serokê Koma Keskan Claudia Roth re derket. Wê di wê hevpeyînê de tişten ku hatin serê HADEP'ê û helwesta polisan a li diji derderen demokratik rexne kir û da zanîn ku rayedaren Tirkîyeyê berî ku bikeve Yekîtiya Gumrukê, gelek sozê demokratikbûnê dane, lê tiştek nekirine".

Her wiha wê daxwaza berdana mebûsên DEP'ê tekrar kir û got: "Ketina nava Yekîtiya Gumrukê wekî gava yekemîn xuya dikir, lê heke wisa here wê bibe gava dawîn ji bo Tirkîyeyê."

DIK Badê kongrey HADEP

23'ye pûşper di HADEP kongreyê xo 2'yini kerd. 30 hezar azayane HADEP Enqere ra vengê xoyê aştî û biratî da dînyay. Waxto ki Serokê Giştî yê HADEP Murat Bozlakî qisey kerdê 2 merdiman ala tirkân ca di cira ci kard eyşt war. Se bi se nowe tepiya bi. Televîzyonan şandi milet ra vat: "Kongrê di HADEP di ala ma eyşt war. Ma HADEP'a xayîn ra hesab pers kim."

Badê weşanê televîzyonan hem verê salon, hem jî miyandi salon di polîsî bî zaflî. Seat jû di Cigirê Serokê HADEP Osman Özçelik vejiya tever, polisan girot bin çim. Senî ki zara di no eşniya Serokê Giştî yê HADEP Murat Bozlakî Wezîrê Miyandi Kar-di Zeñî rê telefon kerd, ey vat: "Mi polisan ra vat, azayane parlementoya HADEP, azayê dîwanî û serokê giştî bigire bin çim, ifade bigire, viradê." Seat 4 di, kongre qedîya, Murat Bozlak fina bî serokê partiyê. Badê kongrey serok, azayê parlementoya partiyê û azayê dîwanî polisan giroti bin çim. Waxto ki otobus şî, azayanê HADEP cepikî cenay û zilxitî antî. Hema polîsî jopana rasay ïnan û 22 teney kerd dirbetinî. 24 di pûşper di se delegey Elbîstanî peyd şîye raya ci, kontr-gerîlayan birnay keleşana nay pa 3 teney kişî, jew di xo jî kerd dirbetin. Fina 24 di aşmî di şaxa İzmîrê HADEP bombe kerd, Nê komploy dom kenê, çim ki HADEP bêna gird. Ew ro hemma hema hemû ca jew û jew rêxistinî akena, qandî jûya dewleta ci ra taşena. Awa wazena HADEP bigiro.

La balê, mayê tiya ra dewleta tirk ra vami, nê komloyon ra faydeye kesî çîniyo. Ti rayedarânê HADEP bin çim giroti se, goş bide vengê aştî. MEMED DIREWS

Li alyê din êrîşen polîsîn tirk ên li ser derderen demokratik têne şermezarkirin û daxwaza ku Tirkîye hurmetê nîşanî hemû peymanen ku imze kirine bide û rê li ser binpêkirina mafen mirovan bigire, jî di nav biryare Parlementoya Ewrûpayê de cih digirin.

Derdorê demokratik jî piştî kongreyê nîrxandinê bi vî rengî kirin. Hate gotin ku piştî agirbestê, dengê aştixwazan gur bûye û bi taybetî piştî qetîşama Basayê û kuştina sê mamosteyen demokrat, gelek mirovan tirk bi kirinê dewletê hesiyan.

NÛÇE

AI ji kuştinê re kirin resperde

Danezana Encama Kongreya HADEP'ê sedema van êrîşan eşkere dike. Di vê danezanê de daxwaza aştî, biratî û wekhevîye heye; her wiha jî daxwaza rakirina DGM, MGK, cerdevaniyê, piştevaniya girtiyan û têkoşîna çînî ya kedkaran di danezanê de cih digire.

Kongreya Duyemîn a HADEP'ê roja 23'ê pûşperê li "Atatürk Spor Salonu" ya Enqereyê bi besdariya 30 hezar kesî pêk hat. Gelê kurd daxwaza biratî û wekhevî û aştiyê tekrar kir. Piştî ku kesan ala tirk ji banê salonê daxistin, li seranserê Tirkîyeyê hêzên nijadperest ci fermî, ci sivil dest bi çalakiyên li dijî gelê kurd kirin.

Girtina serok û rayedarên partiyê têrê nekir, avetiñ ser avahiyê HADEP'ê yên bajar û navçeyan. Avahiya İzmir û Keçiörena Enqereyê hatin bombekirin, sê rayedarên partiyê Mehmet Kaya, Mustafa Öztürk û Hulusi Kul li Pinarbaşıya Kayseriyê bi destê hêzên kontrayî hatin kuştin, Mehmet Kısa jî birîndar bû. Televîzyonan wekî TRT û TGRT'ê bi awayekî vekîf kîfxweşîya xwe li hemberî van rûdanî diyar kirin.

Gotinê Serdozgerê DGM'ya Enqereyê Nuh Mete Yüksel ên piştî kongreyê di din zanîn ku hêzên dewletê ji mêj ve amadevariya êrîşike bi vî rengî kirine. Nuh Mete Yüksel eşkere dike ku demeke dirêj e ku çavêwan li ser çalakiyên HADEP'ê ye.

Rayedarên HADEP'ê piştî kongreyê dan zanîn ku danîna alê bûyereke ji derveyî daxwaza wan, heta dibe ku karê hêzên dewletê be. Her wiha jî wan dan zanîn ku dewlet dixwaze vê bûyerê bi kar bîne û bike hinceta girtina partiyê. Li gorî van daxuyanî, hewldanê HADEP'ê yên piştî hilbijartinan dewlet xistiye nava tîsê.

Derdorê demokratik jî piştî kongreyê nîrxandinê bi vî rengî kirin. Hate gotin ku piştî agirbestê, dengê aştixwazan gur bûye û bi taybetî piştî qetîşama Basayê û kuştina sê mamosteyen demokrat, gelek mirovan tirk bi kirinê dewletê hesiyan.



Tê ditin ku li derive jî rewşa dewletê dijwartir bûye. Wekî mînak di 19'ê pûşperê de Parlementoya Ewrûpayê hin biryar der barê Tirkîyeyê de girtin. Çapemîn û televîzyonan tirk ew biryar ji gelê tirk veşartin. Lî di van biryaran de parlementerên ewrûpi rasterast ji dewletê dixwazin ku ew bi PKK'ê re bikeve diyalogê. Her wiha li ser rewşa girtiyan jî tê rawestin û tê xwestin ku pest û pêkufî si ser girtiyan bê hildan. Parlementerên ewrûpi bi vê ye-kê jî namînin, di serî de mebûsên DEP'ê û İsmail Beşikçi, berdana hemû kesen ku ji ber bîr û baweriya xwe hatine girtin, dixwazin.

Li aliye din êrîşen polîsîn tirk ên li ser derderen demokratik têne şermezarkirin û daxwaza ku Tirkîye hurmetê nîşanî hemû peymanen ku imze kirine bide û rê li ser binpêkirina mafen mirovan bigire, jî di nav biryare Parlementoya Ewrûpayê de cih digirin.

Li ser helwesta hêzên tirk tê gotin ku rayedarên dewletê çiqas bikevin tengasiyê, ew qas zorê didin kampanyayê nîşadperestiyê, ji ber ku di destê wê de ji bilî vê çeka kirêt tiştek nemaye. Xwedîyen nîrxandinê bi vî rengî dibêjin ku, ji ber vê karê dadî spartine Mehmet Ağar, da ku ew bi gurên xwe yên boz, girtiyan teslim bigire. Lî dema girtî dikevin grevê birçî-

bûnê û têne radeya mirinê jî dengê wan na-be xwe. Wezîrê çandê pesna xwe bi qede-xekirina filman dide, wezîrê karê hundirîn ferman dide polisan da ku dema HABITAT'ê de bi sedan karker û karmandan binçav bikin, her heftê êrîşî malbatê windabûyan bikin. Ew tevî van êrîşen li ser HADEP'ê, balê dikişmin ser êrîşen polisan ên li ser derderen demokratik wekî İHD, Partiya Kedê (EP), malbatê girtî û windabûyan.

Dema ku Danezana Encama Kongreya HADEP'ê tê xwendin, sedema van êrîşen li ser partiyê baştîr tê fêmkirin. Di vê danezanê de daxwaza aştî, biratî û wekhevîye heye; daxwaza sekinandina şer, rakirina DGM, MGK, sîstema ceşan, vege-randina gundiyan kurd li cih û warê wan. Her wiha jî piştevaniya girtiyan heye. Tevî van daxwazan tê gotin ku partî tevî piştevaniya mafê kurdan, wê piştigiriya têkoşîna çînî ya kedkaran jî bike.

Li welatê ku di bin ferma MGK'ê de lê şerî taybetî were meşandin, partiya ku van daxwazan bike, helbet wê bibe hedfa êrîşan. Lî bersiva bereya demokratik ji van êrîşan re girîng e. Gotinê hin kesan ên bi rengê, daxistina alê bû sedema van bûyeran, gotineke pêşîyan tîne bîra mirov: "Berê gul bû, baranê lê xist şil bû."

SAMI BERBANG

Perwerdehiya bi zimanê zikmakî

Her wiha encamên erêni ku ji teknik û awayen perwerdehiyê derketine, ji berê firehtir ji civakê re hatine ragihandin û ji bo pêşveçûna mirovatiyê bingehike erêni hatiye vedan. Ji aliye zimên ve em dikarin mînaka wergerendina încîla ku ji aliye Marthin Luther ve ji latîni li almanî hatiye wergerandin, bidin. Bi vê wergerê mirovîn alman încîl bi zimanê xwe xwendine û hîn bûne. Em li vê derê dikarin vê bibejin ku hîmê yekemîn a nûjen a perwerdehiya bi zimanê zikmakî bi vê yekê hatiye vedan.

Ziman, navgîneke ragihandinê ye ku mirovan ew ji organen xwe yên dengê bi pergal û rîkûpêkî pêk anîne û wê ji bo serwextkirina hev û bîlevkirina (anîn ziman) hest û ramanen xwe bi kar tînin. Ziman, berî çêbûna çinan di nav mirovan de jî, hebûye. Ji hebûna zindiyan bi vir de di nav mirovan de bi kar hatiye, pêş ve çûye, di her heyam û serdemê de hebûna xwe domandiye. Ew ji bo têkiliya di navbera mirovan de; peyivîn, nîvisîn, xwendin, têgihîstîn bûye egera bingehîn.

Raman jî wekî têkiliyan bi zimên ve girêdayî ye. Egera yekem a afîrîna ramanê, ziman e. Ziman û raman di heman demê de diqewimin (çêdibin). Ziman ramanê, raman jî zimên diafirîne û dide jiyandin. Mêjûya zimanê bi qandî mêjûya hiş kevn e. Ziman rastiyeke wişa ye ku, ji bo her kesî heye û hişekî pratîk e. Raman jî rasterast bi zimên diğihîje rastiya xwe. Ziman riya pêkhatina zanîn û hilberîna civakî, huner, felsefe, teknik û zanistê ye. Nîrx û hêjahiyeñ ku civak bi xwe diafirîne li gorî her civakê di nava xwe de xwerûtiyekê di guhezîne. Ev xwerûti, civakan ji hev qediqetîne û xwe di hiş û zimanê wê civakê de dide nîşan (eskere dike).

Zimanê ku niha lil dinyayê pê tê axaftin, di pêvajoya dîroka mirovahiyê de bi pêşveçûn û veguherînan re rû bi rû mane. Ew carinan bûye sedema windabûna zimanekî, carinan jî ziman bi wan bi pêş ve çûye. Bi qewmînen diro-



kî, taliye mirov û civakan divêtiya parastina zimanê xwe dîtine û ji bo pêkanîna vê yekê dest bi bikaranîna zimanê xwe kirine. Têkilî û danûstandinê xwe yên aborî û civakî bi zimanê xwe kirine. Vê yekê diyardeya zimanê zikmakî afirandiye.

Zimanê zikmakî ci ye?

Zimanê zikmakî, ji aliye gelek sossyolog û ziman-nasan ve bi pir rengî hatiye saloxdan. Çend ji wan saloxan ev in:

“Ew ziman e ku di nav malbat û jiyanâ rojane de tê axaftin”, “ew ziman e ku kom û civak jî bi neteweyî, di têkilî û çalakiyên xwe de bi kar tînin û hevûdin serwext dîkin”, “ew ziman e ku mirov hest û xwestekên xwe yên ku li ser bûyeran, bi riya wî zimanî ragihînin”, “ew ziman e ku mirov bêyî perwedehîye wî zimanî di navbera hawîr û civaka xwe de hîn dibe.

Mirov bi van saloxan dikare bigihî je saloxeke fireh û zelal.

Zimanê zikmakî; koma ew deng û sembolan e ku mirov wî ji dê û hawirdora xwe hîn dibe, ramana ku bêsekin bi pêş ve diçe, vediguhere û bere bere bi pergal (sistêm) dibe. Bi vê ramanê digel tevlîbûna civakê bi xwe û kesîtiya xwe didin hesandin û bandora xwe datînin civakê.

Bi kurtasî ji pêkanîna gişt çalakî û pergalen hêvotinê re perwerdehî tê gotin.

Perwerdekariya bi zimanê zikmakî

Perwerdehiya bi zimanê zikmakî bi hevkariya giştî dest pê kiriye.

Dema ku mirovatî di civata komunal a kevnare de bûye, bi taybetî di warê neçîrvaniyê de hewcedariya performansa fiziki û taktikî dîtiye û ji perwerdehiyê bi vî rengî sûd wergirtiye. Ev perwerdehî bi zimanê zikmakî pêk hatiye. Mirovîn ezmündar (bitecrûbe) cerîbînên xwe bi pratîk hîn yên naşît û xişiman kirine û ev yek bi vî rengî heta derbasbûna civaka koçberî domiyaye.

Di dema koçberiyê de mirov cih û civakên nû nas kirine û leqayî çandên pir-reng hatine. Kom û civak bi koçkîrinê digel çand û nîrxen hev jiyane, çand û nîrxen wan li hev kelijiye. Ji ber vê yekê jî cudatiya çandan bi hêsanî hatiye dîtin (eskere bûye). Ev jî bûye sedema çêbûna çand û zimanen etnîk û guherîna dirûv, azîne û naveroka perwerdehiyê. Ev rewşa etnîkî, di warê li-hevhatin, parvekirin, sûdjîgirtinê de bere bere bûye sedema bêtirbûna têkilî û ragihandina hundîrî û kîmbûna bandora kes û komên derveyî.

Dema ku mirovan dev ji koçberiyê berdane û derbasî jiyana xwecihî bûne, rewşa xwedanmaliya bi taybet dest pê kiriye. Hin kes û kom, bi sitemkarî yên din xistine bin destê xwe û keda wan xwarine. Di civak û neteweyan de çînîn serdest û bindest çêbûne. Bi pêvajoya demê re, çîna serwer (desthilatdar)

hilberîna ku mirov çekirine, ew ji bo kelka xwe bi kar anîye, xwariye û di encamê de vê yekê bi xwe re divêtiya dîtin û bikaranîna erd (ax) û kanêñ nû anîye.

Derketina hewcetiya perwerdehiya bi zimanê zikmakî

Kom û civak ji bo ku di cih û jêderkîn nû de binişin (bicih bibin) û wê derê ji xwe re bikin welat, bi hev re şer kîrine. Civaka ku bi ser ketiye, ji bo ku serwerî û mîtingeriya xwe bi hêsanî pêk bîne, tevî desthilatdariya xwe xwestiye zimanê xwe jî bi sitemkarî li kom û civakên din bide pejirandin. Di vê demê de yekem car hewcetiya bikaranîna zimanê zikmakî xwe daye hisandin. Lewre wî şerî bi xwe re awayen jiyanke nû anîye. Ëdî mirovan nema kâribûne jiyana xwe bes bi malbatî bido-mînin. Ji ber vê sedemê pêvajoya netewbûne dest pê kiriye. Ëdî perwerdehî ji aliye kesen zana ve di heman dem û cihî de bes ji mirovîn serdest re hatiye kirin. Pê re pê re mirovîn serdest ji bo ku karûbar û mîtingeriya xwe bi hêsanî û bê zehmetî bi cih bînin, di navbera xwe û mirovîn bindest de tebeqeyeke çêkirî afirandine û ew jî perwerdehiyê. Li dû van qonaxen dîrokê, çapkırîna pirtûkan, pêşveçûna zanistê bûye sedema mezintirbûna cihêtiyên ku di navbera çîn û neteweyen serdest û bindest de hene.

Bandora perwerdehiya bi zimanê zikmakî

Di awayên jiyana nû de, pirsgirêka ragihandina zanîn ji bo nivşen nû, derketiye holê. Ev pirsgirêk bi giştî ji cihêtîyen ku di nava çin û neteweyan de hebûne, bi demê re mezintir bûne. Ji bo jiholêrakirina van pirsgirêkan, zanîn û têkiliyên di nav mirovan de hatine bi-bergalkirin. Tevî ku ev yek pêşî bi malbatî û di hawireke teng de bûye jî, pê re pê re li deriveyî malbatê, bi dormandorî û di hawireke fireh de (wekî; dibistan, zanîngeh û hwd.) pêk hatiye.

Ev çalakî di demên dagirkerye de, bi zimanê neteweyen dagirkir hatine kirin. Ji ber ku ev çalakî di serdema na-vîn de her û her bi vî rengî domiyaye, ji aliyê wan ve zagonen (qeyde) wekî; Zagonen Hamurabî, Fermana Firewnen Misira kevn, Zagonen Sazûmaniya dewleten bajarî yê Yewnana Antik û hwd. ku ew bi xwe jiyana civakî bi rêkûpêk dikan, hatine tetbîqkirin. Her wiha encamên erêni ku ji teknik û awayen perwerdehiyê derkotine, ji berê firehtir ji civakê re hatine ragihandin û ji bo pêşveçûna mirovatiyê bingehike erêni hatiye vedan.

Ji aliyê zimên ve em dikarin mînaka wergerendina încîla ku ji aliyê Marthin Luther ve ji latînî li almanî hatiye wergerandin, bidin. Bi vê wergerê mirovên alman încîl bi zimanê xwe xwendine û hîn bûne. Em li vê derê dikarin vê bibêjin ku hîmê yekemîn a nûjen a perwerdehiya bi zimanê zikmakî bi vê yekê hatiye vedan.

Zêdebûna hejmara mirovên xwenda, bi xwe re divêtiya avabûna teknolojiya nûjen aniye. Pergalê çapê hatiye dîtin û pêş ve çûne. Ev pêşveçûnen teknolojîki girfngiya zimanê zikmakî bêhtir kiriye. Di serdema nû û nêzîk de teknolojî gelek bi pêş ketiye navgînên ragihandinê bûyer û tiştinên ku dibin, bi hêsanî û di gavê de digihînin mirovên din. Bi sistematzekirina kompîturan kes û netewe dijwariya tênegihîştina zimanen din nakişînin. Dema ku neteweyek kompîturekê çedike, wê li gorî zimanê xwe yî zikmakî biprogram dike û bi zi-

manzanen me ve ev kar hêj jî nehatiye pêşvebirin. Lê belê divê qet nebûya ji bo jiholêrakirina astengiyen li ber bikaranina kompîturan, çareyeke vebir bi-hata dîtin. Yanê divê ew nîqaş û gotubêjîn ku ev dû sê sal in li ser tipen "î, i, ê, û" tên kirin, dawî lê bihata û ji bo pêşerojê alfabyeke hevpar hatibuya çêkirin.

Wekî em dizanin rewşa zimanê kur-dî ku tê de ye, li dînyayê rewşeke bê-hempa ye. Em dikarin bibêjin heta niha zimanê me di her warî de qedexe bû, iro jî ev rewş berdewam e. Lê bi fermî-

Ger em dixwazin wekî kes û mirovek kurd bijîn, divê em ramana xwe ya bi kurdî pêk bînin. Divê em wekî kur-dekî/ê bijîn.

Di her warê jiyanê de; li malê, li der, li bazarê (erese) têkilî û danûstandina xwe bi kurdî bikin. Divê em banekiya (hînbûyîn) xwe ku ji zimanen biyan re çêbûye, ji ser xwe biavêjin. Her çigas ziman û raman bi hev ve girêdayî ne, ew çend raman û jiyan jî bi hev ve girêdayî ne.

Şoreşa me bes ne politikî ye, şoreşa çand û hûnerî ye jî. Ji bo afirandina berhemên çand û hûnerê yê bi kurdî zanîn û fikirîna bi zimanê kurdî jiyana kurdîti divê. Ji bo ku ew, berhemên ku tên afirandin ji gelê kurd re bibin mal, divê bi zimanê kurdî bêñ nivîsin, bi gotin û jiyana kurdîtiyê bêñ honandin.

Di dawiyê de em dikarin vê bibêjin. Ziman ji bo her warê jiyanê egera girîngîtrîn e. Ji bo danpejirandina hebûna xwe, divê em tu car ji zimanê xwe bi dûr nekevin, her û her wî bidin jiyan-din. Divê em ji bo astengiyen ku di pêşerojê de derkevin pêş me baş binir-xîn û ji niha ve wan yek bi yek çareser bikin û ji holê rakin. Divê em tevî dil û hinav, goşt û hestî, jiyân û ramana xwe wekî kurdeki/ê bijîn. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî ku em niha jê bêpar in bi jiyana xwe wê pêk bînin. Nirx û hêjâhiyên netewaya xwe baş binasin, bizanîn û li ser vî hîmî ji xwe re pêşerojeke xurt û zexim amade bikin.

DILAWER

Şoreşa me bes ne politikî ye, şoreşa çand û hûnerî ye jî. Ji bo afirandina berhemên çand û hûnerê yê bi kurdî zanîn û fikirîna bi zimanê kurdî jiyana kurdîti divê. Ji bo ku ew, berhemên ku tên afirandin ji gelê kurd re bibin mal, divê bi zimanê kurdî bêñ nivîsin, bi gotin û jiyana kurdîtiyê bêñ honandin.

manen û sembolên navneteweyi jî dirarêse (donanim).

Girîngiya zimanê kurdî di têknolojî û perwerdehiyê de

İro em bala xwe didinê, her netewe klavye, dîsk û tûşen kompîtûre yeke-mîn car ji bo peyvsazî û rîzimaniya xwe bi rîz û program dikan. İro em kurd her çend negîhîstîbin qonaxa xwendan-dewletiyê jî di vî warî de gelek gav hatine avêtin. Lê rîzimana zimanê me tevî ku Mîr Celadet Bedirhan hîma wê ya yekemîn avêtiye jî, ji aliyê rîzi-

tiyê! bi fermîtiyê zagonen Tirkîyeyê. Em ji xwe bipirsin: "Di têkoşîna çekdarî, polîtikî û wekî wan de em vê yekê nepejîrîn, gelo çîma di warê zimên de em vê nepejîrandina xwe pêk naynî?" Em her û her ji hev re vê dibêjin: "Qet nebe li mala xwe bi kurdî bipeyivin". Na, bi ya min ev ne bes e. İro neteweyen din ên dînyayê di her warê jiyanê de, wekî: aborî, danûstandin, jiyana navmalê û ya deriveyî û hwd. zimanê xwe bi kar tînin. Lê em çi dibêjin, qet nebe li mala xwe!..

Wekî me li jor jî gotibû, ziman ji bo afirandina ramanê egera yekemîn e.

zehmet e. Hin kesen ku ji nivîsandinê re gelek jêhatî ne, eger van gotinê min bixwînin, wê berê pêniyîsa xwe bidin min û bibêjin: "De malava ji du heftiyan carekê jî tu nikarî nivîsekê amade bikî? Eger tu nikarî vê yekê bikî, nexwe ev çi kirasê roj-namevaniyê ye, te li xwe kiriye?"

Eger bibêjim "Ez bi çend karê din re jî eleqedar im, wekî nivîsandina ji bo hin kovar û rojnameyên din, her hefte amadekirina bernameyeke televêzyonê, hewldana zêdeki-rina aboneyan ji bo rojnameyê û hwd.", gelo ezê karibim bi we bidim bawerkirin ku ji ber nebûna wext, vî karî bi derengiyê dixim. Lê hevalen navenda rojnameyê baweriya xwe bi van gotinê min bînin jî, feyde nake ji ber ku bi van gotinan ez nikarim xwe bidim bawerkirin. Wekî din, jîxwe hin kesen din jî eynî rexneyê li min dikan, çîma ku ez ji wan re jî bi derengî dîniyîsim. Gelo niha jî yek ji we rabe bibêje, "De Xwedê ji te razî madem wisa ye, nenivîse, ma tu nenivîsi, wê çanda kurdî ji holê rabe, an jî ma nivîskar qeliyane ku her kes ji te daxwaza nivîsandîne dike? Kurê xelkê her roj bi dehan tîstan dîniyîsin, jîxwe behsa nivîsen xwe jînakîn, vêca em ji te hêvî dikan ne binivîse ne jî wisa pesnê xwe bide û bargiraniyê xwe li me bike."


Êê ma ezê li hemberî van gotinan bêdeng bimînim? Helbet namînim û bizanîn ku mesele ne meseleya erz û talebê ye. Eger kesen bi kurdî dîniyîsin pir bûna, wê çîma gelek kovaran ji yekî mîna min ku tembelê nivîsandinê ye, nivîsanda.

kesen ku bi kurdî dikarin bi awayekî rîkûpêk ji weşanen periyodîk re binivîsin, li seranerê bakurê Kurdistanê ji sedî nabore û pêniyîsa nîvîkî wan jî (Bila li min bîborin) jîxwe wisa zêde ne bîhêz û hûner e. Inca Xwedêkî hûn kî ditîrsînin? Gerçî çend sed kes li Stokholmê jî hene ku dikarin bi kurdî bixwînin û binivîsin, lê ew jî ji bo xwe pirtûkan amade dikan, hîç wextê wan tune ji rojname û kovaran re binivîsin.

Êê hingê jî dimînin em û em. Yanê hevalen li rojnameyê û hin kesen din ên weşanîne periyodîk dertînin, ji neçarî wê li pey min bigerin, qet nebe heta demekê, wisa xuya ye ku ev dem jî wê têra xwe dirêj be. Di asoyê nivîskariya kurdî de, heta sê wextê dir jî reşahîyeke ku bibe mîzgîniya guherîna vê rewşa heyî ya belengaz, xuya nake. Ji ber ku hê jî hejmara xwendevanen kurd li dora du sê hezaran e. De ka bifikrin, heta ku bi sed hezaran xwendevan çêbin, bi hezaran kes bi kurdî binivîsin û ji nav van ên dawî nivîskaren ji dil derkevin piyaseyê, wê çend wext di ser me re derbas bibin? Hingê êdî hûn nivîsen min newesîn jî jîxwe ezê têra xwe meşhûr bibim. Lê kî dizane, dibe ku heta hiğê ez jî pêniyîsa xwe tozekî bîhuner bikim û xwe ji vê tembeliyê jî pariye kîrizgar bikim. Ta demeke din ku min dîsa ji kerema xwe qam kir û ji we re nivîsand, gelo hevalen navendê çend carê din li ber min bigerin? Ma ew dikarin çi bibêjin ji xeynî vê biwêja kurdî ya nû: "Xwedê nivîsandina bi kurdî ji desten nenivîskaren tiral û tembel rizgar bike."

Mekanîzma bergiriyê û qiseyên qor

MAZHAR GÜNBAT



Hûn hîç ketine krîza nivîsandinê? Ji yênu ku dibêjin 'Erê' re pirseke din: Ci car di gotinê xwe yê devkî de hûn rastî enflasyonê hatine? Eger bersiva vê jî erêbe, fermo pirseke din: Gelo hîç, her du bi hev re wekî du mîvanen nevexwendî bûne bela serê we? Dora erêyekê jî ya min e. Jîxwe piştî ku ew her du bi hev re hatin mîvanîyê, hingê depresyon û stres jî li deriyê mirov din, li tenîş wan her du karesatîn din, ev ên nû jî çarmîrgîyê vedi din. Digotin di nav atmosfera biyanîker a kapîtalîzma Ewrûpa de ne mîvantî maye ne jî mazûvanî. Ew ne rast e, ji roja ku ez hatime Ewrûpa, ta vê kîliyê mîvanan ez bi tenê nehiştîme. Her çendî nevexwendî jî bin, li cem me kurdan adet e divê mirov bi wan re sohbîte bike. Lê hingê hûn xwendevan jî ji qiseyên qor pê ve beredayî li gotinê girfngî digerin di sohbata mazûvanê ku ew çend cinawîrî xwe jê re kirene mîvan.

Hevalen navenda rojnameyê do dîsa li min geriyan û hînek jî bixeyd gazîcîn xwe li min kirin, ji ber ku min dîsa nivîsa xwe, bi derengiyê xistibû. Pêwest bû ji du heftiyan carekê min binivîsanda, lê bi rastî karekî zor

Merheleyên şoresê û du awayê şoresgeriyê

Xwendevanê kurd ku dihatin Stenbolê, berî her tiştî ramanê Çetin Altan û İlhan Selçuk dixwedin. Wan doza welatê xwe ji mêjiyê xwe diavêtin, di civat û civînan de rexne li me digirtin û digotin: "Hûn welatparêz, zimanparêz û nijadperest in. Hûn paşverû ne. Di demeke kurt de wê sînor ji nav welatan rabin. Ji bo rizgariya kurd û Kurdistanê tu têkoşîn ne lazim e, wê xweber heh bibe."

Di salên şêstî de, ev çepêن tirkan ku bi şoresê re xiniz in, wekî Çetin Altan û İlhan Selçuk, yekî di rojnameya Akşamê de, yê din jî di rojnameya Cumhuriyetê de bêrawestan lî ser sosyalîzmê û rîveberiya wê dînîsanîn. Wekî du teyrîn dubirak bûn, pesnê hev û din didan. Pêşengîya şoreşa Anatoliyayê dikirin. Em xortên pêşverû me giştan nîvîsên wan dixwedin û em li sei şopa wan dicûn.

Ji aliyê din ve civateke me hebû û di wê civatê de pêşengîn me, yên sosyalîst û welatparêz hebûn, mîna Musa Anter, Yaşar Kaya, Edîp Karahan, Canib Yıldırım, Örfî Akkoyunlu, Medet Serhat û hwd.

Xwendevanê kurd ku ji Kurdistanê dihatin Stenbolê, berî her tiştî ramanê Çetin Altan û İlhan Selçuk dixwedin. Ew dibûn sosyalîstên navneteweyî (internasyonal). Wan doza welat û niştîmana xwe ji mêjiyê xwe diavêtin. Ji ber ku têkîlî û peywendiyê me bi wan pêşengîn welatparêz re hebûn, hinek welatparêzî bi me re mabû. Xortên kurd yên sosyalîstên navneteweyî di civat û civînan de rexne li welatparêziya me digirtin û digotin:

"Hûn welatparêz, zimanparêz û nijadperest in. Hûn paşverû ne. Di demeke kurt de wê sînor ji nav welatan rabin, her tişt bi sosyalîzma Çetin û Selçuk wê çareser bibe. Ji bo rizgariya kurd û Kurdistanê tu têkoşîn ne lazim e, wê xweber hel bibe."

Min pirsa xwe xiste serê Apê Mûsa ji

Di wê demê de pirtûkên pêşverû ku li ser rizgarkirina gelên bindest hatibûn nîvîsanîn, bi zimanê tirkî nîn bûn, ango li zimanê tirkî nehatibûn wergerandin. Piştî ku Zagona Bingehîn ya 1962'yan, hêdî hêdî pirtûkên çep werdigerandin zimanê tirkî. Bi mehan yek, dudo derdiketin. Me jî, ji dikana Aşik İhsanî dikirin. Min di wan pirtûkan de bersîva vê pirsgirêrkê peyde nedikir.

Ji rojan roja pêncembê bû. Ez çûm mala Apê Mûsa, li baxçe me çay vedixwar. Ez û ew, em bi tenê bûn. Min egera vê pirsgirekê jî pirsî: "Ya Xalê delal! Ez ci qasî bala xwe didim xortêن kurd ên pêşverû çaxa ku li welêt dixwedin, welatparêz bûn, lê ku tenê Stenbolê ew xortê delal têñ guhartin. Bi texmîna min tiştin wan berevajî dikin. Hinek wan serûbinê hev dikin. Li ser vê ramanê tu ci dibêjî?" Wî "Wekî kî?", got. Min "Wekî Çetin Altan û İlhan Selçuk, xortê kurd di çerxa wan de têñ pîsaftin û guhartin", gotê. Min dît çavêñ wî leyistin û got:

-Na lawo, na. Çetin Altan û İlhan Selçuk mirovîn

pêşverû ne, xizmeta me dikin, li wan ewle bin, em û wan di şopekê re dimeşin, hevrê û heval in.

-Wele ez bi wan ne ewle me, dibe ku riya me jî ne yek be.

-Ka ji min re şîrovet bike. Bi ci gumanê?

-Ez nizanim. Ji ber ku ez nizanim min ji te pirsî.

Wê rojê me tiştek nexist serê hev. Lî min temîn kir ku di serê wî de jî bû pirs.

Roj bi roj rewşa me xerabtir dibû. Em gişt endamên FKF'ê (Fikir Klubleri Federasyonu) bûn û em bi dil û can tê de dixbîfîn. Lî her bala min li ser wê ramanê, li ser wê pirsgirekê bû. Di

sala 1968'an de, wekî her car ez û hevalê xwe Dr. Burhan Veii Yaşar çûn dikana Aşik İhsanî, İhsanî ji me re qawînê Salih Pismamo danî ser gramofonê û got: "Hûn li strana min ya nû guhdar bikin, ezê pirtûkên nûderketî ji we re bipêcim. Va ye pirtûkeke Mao derketiye, navê wê "Yenî Demokrasi" ye.

Bersiva pirsa me Mao da

Min pirtûk xwend ku bersiva ramana min û pirsgirekê me gişt di wê pirtûkê de ne. Mao "Rizgariya civakan di du merhaleyan pêk tê. Ya pêşî rizgariya neteweyî û ya duyemîn rizgariya aborî ye. Heta rizgariya neteweyî neqede ya aborî çenabe. Anglo rizgariya aborî piştî ya neteweyî dest pê dike", dibêje. Min pirtûk xist bin cengê xwe û berê xwe da Suadiyeyê ma-la Xalê Mûsa.

Xalê Mûsa li baxçe rûniştiye, berga pirtûka Mao di destê wî de spî dike û ew dixwine. Çav li min ket, pir-




tûk danî ser maseyê, rabû pergî min ve hat û got:

-Doktor ka ez eniya te maç bikim.

-Çima, Xal?

-Va ye bersiva pirsa te Mao daye. Erê navê me yek e, em her du alî şoreşvan û têkoşer in, lê şoreşen me ji hev û din cihê ne. Em di şoreşa yekemîn, ew di ya duymîn de ne.

Ji wê demê ve, şoresgerên tirkan dagirkeriya mejiyê xortê kurdan dikirin û ji wan be wê hîn jî bidomînin, lê eşkere bûne. Ma wê kî bi wan ewle bibe. Va ne rasterast nijadperestiyê dikin. Anglo sosyalîstên nijada xwe ne, qaço sosyalîst in. Apê Mûsa, ji gorê serê xwe rakiribûya û li rewşa wan binihîriya wê tû bikira rûçikê wan i belek. Apo di nîseke xwe ya dawî de gotibû: "Ez dikarim Çetin Altan efû bikim" Anglo bi durûtiya wan hesiyabû.



● **2.7.1993:** 37 kes li Sêwazê li Hotêla Madîmakê ji aliye olperestêna faşist ve hatin şewitandin. Nivîskar Aziz Nesin û hin hunermend û rewşenbîr ji bo şahiya Pîr Sultan Abdal çûne Sêwazê. Ji ber axaftineke Aziz Nesin olperestêna faşist agir berî Hotêla Madîmakê dan, Aziz Nesin bi sax filî. Lé 37 kes di hotêlê de can dan.

● **4.7.1966:** Faik Bucak ji aliye MİT'a Tirkiyeyê ve li Ruhayê hate kuşun. Faik Bucak di sala 1919'an de li Siwêregê hatibû dînyayê. Bucak hem bi xebatên xwe yên ji bo rizgariya kurdan hem jî bi nivîskariya xwe dihate naskirin. Di salê 1935'an de li Stenbolê ji bo telebeyên kurd wî tevî hin rewşenbîrên kurd bi navê (Dicle Talebe Yurdu) avahiyek vekirin.

Piştî ku Fakulteya Hiqûqê diqedîne li Kozanî û li Zarayê dadgeriyê (hakim) dike. Pişt re li Ruhayê parêzeriyê (ebûqatî) dike. Di vê navberde ji ber fîkrêna xwe yên kurdî salekê li Balikesirê di girtigehê de dimîne.

Di derbeya 1960'an de ew jî bi 55 rewşenbîrên kurd ve hate sîrgûnkirin. Di sala 1964'an de bi hin rewşenbîrên kurd ve Partiya Demokret a Kurdistanê (KDP) ê li bakurê welêt ava kir.

● **6.7.1995:** Aziz Nesin cû ser dilovaniya xwe. Nivîskarê mîzahê Aziz Nesin di sala 1915'an de li Stenbolê hatibû dînyayê. Ew hem bi nivîskariya xwe hem jî bi fîkrêna xwe dijberê dewletê bû. 90 berhemê Aziz Nesin hene. Dema ew mir di ser 80 salf re bû.

AWIR

Li NÇM'ê hewla nûjenkirina stranên gelêri



Komeke taybet a Navenda Çanda Mezopotomyayê konsereke bi navê "Konsera Muzika Gelêri ya Kurd a Nûjen" pêşkêş kir, li salona NÇM'a Stenbolê.

Roja 22'ê pûşperê ev koma muzikê derkete ber temâşevanê xwe û nêzîkî du saetan bi stranê xwe dilê temâşevanan ges kir, her çiqas sazûmâniya deng xerab bû jî.

Endamên vê komê ji komên muzikê yên NÇM'ê û ji sê kesên ji derive ku bi enstrûmanê xwe tevî vê xebatê dibin, hatiye sazkirin. Li gorî-gotina muzîsyen Serhat ku hem yek ji endamên vê komê, hem jî yê Koma Amedê ye, ev agahî dan li ser vê xebatê xwe: "Hejmara endamên me 7-8 kes in. Ev kes ji aliye felsefaya xwe ya hunerê ve nêzîkî hev in û her yek ji wan di koma xwe de yên herî bi huner in. Tabî ew nayê wê mane-yê ku endamên din ên wan koman bê-huner in. Ji ber ku ev kesên hilbijartî dixwazin xebateke bi vî rengî pêk bînîn û tev jî nêzîkî xebata vî cureyî ne, di vê komê de hatine ba hev."

Muzikêni vê komê bi giştî ji stranêna gelêri pêk hatine. Lé çend parçeyên nû jî di nav stranê wan de têr dîtin. Der heqê vê yekê de jî Serhat dide nîşan ku: "îro gelê kurd di nav têkoşîmekê de ne. Ji ber wê jî, divê mirov ji demajoya îro dûr nekeve. Bingeha xebata me ew e ku, em motifîn muzika gelê kurd, bi enstrûmanê Rojava re têkilîhev dike. Bi alîkariya enstrûmanan em blues, rock û popê diceribînin û stranê xwe bi

awayekî hemdem pêşkêş dikin."

Ev kom enstrûmanen mîna; Bas-gitar, piyano, gitar, üd, bisk, kanûn, ney, baxlama, zirne û dahol bi kar tîne.

Li gorî gotina Serhat ev kom wê piştî bi demekê bi awayekî orkestrayê xebatê xwe berfirehtir bidomînin.

Divê were gotin ku xebatê bi vî ren-gî rî li ber muzika kurdî vedikin û muzîka kurdî hem ji monotoniya deng hem jî, ji monotoniya enstrûmanan xelas dike. Yanê hem di deng hem jî di enstrûmanan de pirdengî tê cerîbandin.


Di vê konserê de tiştekî bala min kîsand. Parçeyen ku hatin strîn tev bi kurdî bûn, lê di axaftina wan a kurdî de bi rastî jî xeletî gelek bûn. Hele hin termen muzîkê hebûn ku an tam ji tirkî hatibûn wergerandin, an jî bi awayekî şaş bi kar dianîn. Mesela, beriya ku parçeyekî soranî bistrin, hate gotin ku: "Ev helbesta me soranî ye." Wekî ku helbestek were xwendin! Mînakeke din jî, stranbêjekî wê kilamek bixwenda, dîsa hate gotin ku: "Hevalê me stranekî dirêj bixwîne."

Her çiqas muzîsyenê kurdan di warê muzikê de pêşveçûn danîbin ber xwe jî, ji vê rewşê jî xuya ye ku ew xebatê xwe yên li ser muzikê bi tirkî dike. Ev yek jî di demen wiha de dibe sedema hin kîmasiyen. Divê hunermendê kurd bi qasî strîn û lêdana ambûran, ji termen muzikê yanê literatûra wê jî haydar bin. Lewre pêdivî hem bi muzikê hem jî bi literatûra wê heye.

AYNUR BOZKURT

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



Kongreya HADEP'ê, provokasyon û operasyonê dewletê

Dewleta tirk her ku diçe di nav krîza politîk, aborî û eskerî dê cûm-dibe. Çiqas krîz kûr û berfireh dibe, dewlet jî ewqas dîn û har dibe. Provokasyon û operasyonan pêk tîne. Büyera kongreya HADEP'ê jî, ji wan provokasyon û operasyonê dewletê yek e. Daxistina ala tirk hincet (bahane) e. Ji bo ku operasyonan xwe yên wehşî ji raya giştî ya Tirkiyê û cîhanê veşerin daxistina alayê sedem nîşan didin. Alaya Tirk dabiketa an neketa dê dîsa van êrîşen xwe bibirana ser HADEP'ê. Dikarin hezar provokasyonê din pêk bînîn. Dewleta tirk bi hemû dem û dezgehêne xwe yên sivil û eskerî ve, li hemberî têkoşîna bizava (tevgera) rizgarî ya gelê kurd ketiye nav bê çaretiyeke kûr û aloz. Ew di nav vê alozî û krîza han de, dixwazin hemû hêrs û nefreta xwe ji serê réxistin, dem û dezgehêne demokratik derbixin. Ji ber vê yekê jî, bi awayekî vekirî êrîşê HADEP'ê dikin.

Dewlet di warê demokratik de ji HADEP'ê ditirse û hesabê hilbijartinê dike. Fw dibîne ku HADEP bi réxistinî di nav gelê kurd de xurt dibe. Li Metropolan bi hezaran kurdên koçber û penaber dixe nav xebat û çalakiyan. Heger di nêzîk de hilbijartin çêbe, HADEP vê carê bi xurtî dikeve parlementoyê. Heger carekê piyê HADEP'ê ket parlementoya Tirkiyeyê, êdî careke din ew nikarin bi hêsanî HADEP'ê wek DEP'ê ji parlementoyê derînin. Rewşa kurdan, raya giştî ya Tirkiyeyê û cîhanê niha li dijî wan e û nikarin wê rewşê dubare bikin. Ji ber van sedem û hesaban ji niha ve dixwazin pêş li HADEP'ê bigirin. Provokasyon û operasyonan li ser HADEP'ê çedîkin.

Ji aliye din ve jî, pêwist e ku HADEP jî, wekî partîyeke demokratik û girseyî xwe biparîze û xebata xwe di vê çarçoveyê de bîmeşîne. Kesên endam, semâfîzan û dilsoz jî, di nav vê çarçoveyê de û li ser vê bingehê nêzîkî HADEP'ê bibin, ji destûr û xebatê wê re rez û hurmetta xwe bidin nîşandan. Barê ku HADEP nikare ji bîn rabe, nadin ser milê HADEP'ê, baldar û hişyar bin; rî li provokasyonan bigirin. Di nav vê çarçoveyê de, ji rengîn û dewlemendiya bîrûbîriyê cihê re rezdar bin.

Dewleta tirk dixwaze bi bûyera daxistina ala tirk, nîjadperestiya tirk xurt bike û bi vê yekê gelê tirk bixapîne. Êrîşen kontra û nîjadperesten tirk bi maf nîşan bide. Çapemeniya Tirkiyeyê dest bi kampanya derewan kiriye. Ji Serokmar Silêman Demirel heta, Serokleskerê tirk Karadayî û hînek sendîkayê karkeran li dijî kurdan kampanyaya şovenîzm û nîjadperestiyê li dar dixin. MHP'yi yên faşist êrîşî ser bar û bargehîn HADEP'ê dikin. Rê li pêş nûneren HADEP'ê yên ku beşdarî kongreyê bûbûn dibirin û wan şehîd dikin. Bombe davêjin ávahiyê HADEP'ê. Bi însiyatîf û alîkariya polîs û eskeran li dijî gelê kurd mîting û nûmayışan li dar dixin. Mal û cihêne xwe yên kar bi alên tirk dixemîlinin. Li Kurdistanê jî dest bi operasyonan dikin. Bi kurtî li dijî gelê kurd iro seferberlik heye.

Cî bûye, cî ciriyaye? Serî binî keseke di kongreya HADEP'ê de alaya tirkan avetiye erdê. Qaşo "ala wan şerefa wan e, simbola welat û neteweya wan e. Wekî netewe heqaret li wan hatiye kîrin" Ji bo vê yekê jî, dînyayê xerab kîrin û dikin! Lî hûn dibînîn, ev nêzîkî hezar sal in ku tirkan Kurdistan dagir kîrine. Ne bi tenê ala kurd, her wiha navê kurd, navê welatê wan reng û zimanê kurdî qedexe kîrine. Hemû heyinê seranserê erdê Kurdistanê talan û wêran kîrin û dikin.

Di van 15-20 salin dawî de, bi qasî nîv milyon esker, polîs û caş kirine nava Kurdistanê, bi fizîkî her roj dest davêjin namûsa kurdan. Dîsa di van çend salen dawî de, nêzîkî 3000 gundêñ kurdan wêran kîrin, 10 milyon kurd ji ser axa wan rakirin. Bi hezaran kesen kurd kuştin. Tu nîrx û rûmet ji kurdan re nehiştin. Ma ev ne destdirêjiya şerefa kurdan e? Ne destdirêjiya ax û yekîtiya neteweya kurd e? Gelo ev ci ye? Ev provokasyon û operasyonê giştî, ne bi tenê li dijî HADEP'ê ye, bi awayekî geleperî li dijî gelê kurd e. Pêwist e ku em refen xwe yên nîştanperwerî û şoreşgerî xurt bikin. Pêwist e ku em bala mirovîn tirk û şoreşger û demokrat jî bikşînin ser vê rewşê. Li dijî nîjadperestiya tirk mil û dest bidine hevdî.

Ji devê şervanekî Seîd Riza, Serhildana Dêrsimê

Ji dîrokê re rûpeleke jîndar

Her tim tê gotin ku dîroka
gelan divê bi destê
dîrokzanê wan bêne
nivîsandin. Lé dema em
rewşa gelê kurd tînin ber
çavan, dîroka kevn deynin
aliyekî, hê dîroka nêzîk bi
awayekî baş nayê erhevkinin.
Heta ji me tê, em dixwazin di
vî warî de jî hin gavan
iavêjin. Bi vê mebestê hevalê
me DÜZGÜN DENİZ bi şervanê
Seîd Riza, Hesenê Halborî re
ev hevpeyvîn pêk anî.

Kalo em dizanin ku tu di ji-yana Serokê Serhildana Dêrsimê Seîd Riza re wekî alikar, wekî parastvan bû. Gelo Serhildana Dêrsimê çawa dest pé kir?

— Serhildanê, di sala 1937'an de dest pé kir. Ji bo destpêkirinê gelek sedem hebûn; lê di vir de bi ya'min du bûyer girîng in. Aboriya gel gelek xerab bû Zilam vir de wir de diçûn ku ji zarokên xwe re tiştekî wekî xwarinê bînin.


Ya yekemîn, li Pilûrê (Ovacık) zilamek diçe ji malekê bizinekê didize û tîne mala xwe, bi şev serjê dike û dide zarokên xwe. Dûv re jî xwediyê bizinê vê yekê dibihîze û diçe qereqolê giliyê wî zilamî dike. Pişt re leşker jî têna ma-la wî seh dîkin tiştekî bi dest naxin.

Cend roj bi sün de, leşker dîsa diçin û ew dîsa direve naakeve destê leşkeran. Serlesker jî jina wî digire, dibe qereqolê û wî şevê li qereqolê dihêlin. Serê si-bê jinikê berdidin, ew tê malê.

Zilam dafikekê amade dike, diçe ga-zî notirvanê (bekçî) gund dike, dibêje: "Ez dixwazim herim teslim bibim, lê belê min ji bo dilxweşkirina leşkeran xwarin amade kiriye, niha sıfre li erdê ye; ji kerema xwe gazî qereqolê bike, bila werin pariyek nanê min jî bixwin û ez jî dû re teslim bibim." Notirvan diçe û gazî dike, serleskerê qereqolê û 11 leşker diçin mala zilêm.

Xwendevanê hêja bizanin ku, dî-roka kurdan a nêzîk jî di bin axê de ye. Lé iro hêdî hêdî lê tê kolîn. Ev jî heye, her tim lêkolîn sedî sed rastiyê nadîn. Ji ber ku carinan rast-kirina hin idîayan ne mimkun e. Ev astengî di vê nivîse de jî heye.

Hesenê Halborî (Halvorî) ku me pê re hevpeyvîn kiriye, gelek pîr e (kokim). Li gorî agahîyan, salêن wî ji sedî boriye û guhêن wî jî baş nabi-



Xwediyê malê, wan li ber derfî difermîne û diçin hundir. Tîvingê leşkeran ji destê wan distînin û bi dar ve dikin. Leşker ku rûdinin li sér xwarinê, êdî zilam radibe, tîvingê digire destê xwe û dibêje: "Ku dizî hatiye kîrin, min kiriye, heke ku hûn li diz digerin, diz ez im. Ma hûn çîma pîreka min dibin, şevekê li nav xwe dihêlin?" Pişt re jî wan gulebaran dike. Di vê gulebaranê de 12 leşker û serlesker hemû tênu kuştin. Bû-yera yekemîn ev e.

A duyemîn jî li ser Pira Paxê derket. Ew jî, ji hatina tabûrên leşkeren tirk bû. Beriya vê bûyerê jî Çemê Xarçikê wî alî (aliyê Mamekî) hikûmet tune bû; ji ber ku leşker û qereqol tune bûn. Dema ku leşkeran li gundê Paxâ Suran, jî daran pireke mezin pêk anîn, dewleta tirk ev pir ji bo operasyoneke mezin amade dikir. Dû re jî, tabûrek leşker derxistin

hîzin. Wekî din jî nexweş bû. Ji ber van tiştan hin pirsên me yêng girîng bêbersiv hîstin. Mirov di şexsê vî ka-lê me de, şikestibûna bermahiyêن serhildanêñ kurdan dît. Ji her alî ve ev kes hê jî di dudiliyê de ne. Teví ku dilê wan kesan her tim bi dîroka wan re ye jî, ji tirsa hovîtiya ku dîti-ne, gelek tişt nayîn zîmîn.

Hesenê Halborî bi xwe şervan û parêzvanê Seyid Riza bûye. Teví vê

Ciyayê Tûligê: Hefteyek an jî du heftê li wir man neman, dîsa zivirîn cihê xwe yê berê. Li gorî baweriya me ew tabûr ji bo kifş û planêñ hereketê çûbû.

Şevekê çend kesan gelek êzing kişandin ser pirê; benzîn berdan ser û şewitandin. Pir tev hilweiya. Dibêjin ew bûyer bi destê Baqî Dewletî û hevalên wî hatiye kîrin. Gava ku agir pê dixin Qereqola Paxê jî gulebaran (remî) dikin. Di vê bûyerê de serleskerê qereqolê sertof (yüzbaşı) tê kuştin. Tê gotin ku kesê ku tîving berdayê kumandar di wê demê de qêriyaye û gotiye: "Ji min re dibejin Findiq Axa, Findiqê Qemer Axayê Eşîra Üsîvan (Jî Mala Murtê Aj). Ez ew im, min baş nas bikin!"

Dibêjin li ser vê bûyerê Findiq Axa di demeke kurt de tê girtin û wî bi dar ve dikin. Bi ya min ew bûyer filehan (ermenî) pêk anîbû.

Heviya me ew e ku, van tiştan ku hatine gotin bi desten hevalen din bêne sererastkirin. Lé divê em desten xwe zûtir bigirin, hîn ku, pîr û kalêñ me winda nebûne.

DÜZGÜN DENİZ

Seyid Riza zilamekî çawa bû?

— Di navbera çûnûhatina leşkeren tirk (ji Tûligê) de eşîren kurd bi hev re çûn cem Seyid Riza, pê re peyivîn. Gotin: "Em li ber xwe bidin û tu jî bibe serokê me." Seyid Riza bi ber wan geriya nebû; Seyid Riza wê demê bi Serokeşîrê Demeñan Cibraîl Axa re jî kirîv bû. Belê baweriya wan zêdetir bi hev re hebû. Tesîra vê yekê li ser Seyid Riza pir bû. Û wî jî êdî li ser vê baweriye qebûl kir. Ji ber vê yekê jî êdî wî serokatiya serhildanê girt ser milê xwe. Bi vî ren-gî peymana serhildanê hate çekirin.

Haa!.. Hûn gere bizanibin ku Seyid Riza ne kesekî ji rêtê bû. Ev zilamekî taybet bû. Ji ber ku di Şerê Gerdûnê yê Yekemîn de dema leşkeren tirk ji ber ar-têşa ûris direviya, wî bi serê xwe ji wan re ser kir û ev bi sün de vegerandin. Kumandare leşkeren tirk yê Xozatê ku jê re digotin Delî Xalit Paşa, rutbeya wî serguran (bînbaşı) bû.

Dema leşkeren rûs hatin, wî li Xozatê kumandarı dikir û di wê demê de bi awayekî resmî alikariya Seyid Riza xwest. Seyid Riza jîxwe dixwest ku bersiva ûris bi serê xwe bide; ji ber vê yekê jî ku dewleta tirk tiştek nekiribûya, gerek e wî dîsa jî bersiva ûris bida. Li ser vê yekê jî wî artêşa ûris heta Erziromê ajot û zivirî hat 8-9 mehan li Erzinganê, wekî walî li wir ma û ew

der ïdare kir.

Seyid Riza ji kîjan eşîrê bû, malbata wî çawa té nasîn?

— Seyid Riza ji eşira me bû. Navê eşîra me Awasan (Abasan) e. Lê belê eşîra me ya mezin Şêxhesenê. Navê vê jî ji navê damezrênerê eşîrê kalikê me Şêxhesen û birayê wî Şêxamed tê. Ew her du zilam li gorî secereya me:

Ji gundê Meletê hatine aliyê Dêrsimê. Lewre li derdora navçeya Nazmiyê kon (bi cih) bûne. Li gorî agahiyan, cihê wan cihê xiristiyanan bû, ji ber vê yekê jî, ji wan re digotin Xarîç. İro li wir gundê Xarîg heye. Li vê derê ji xwe re xanî amade dikin, pişt re jî dest bi cotkariyê dikin.

Çend sal derbas dibe, kes nizane, lê belê keça, kalikê me Şêxhesen mezin dibe û dibe ciwan. Rojekê xebatkarekî wî, dixwaze bi vê keçikê rî bizewice. Şêxhesen jî li dîjî vê yekê dernakeve û wan dizewicîne. Wexta zevîajotinê, keça Şêxhesen tê balê û jê re dibêje:

“Bavo em dixwazin tu ji min re cihekî veqefîni ku em jî ji xwe re biajon.”

Li ser vê peyvê ev jî dikene û dibêje: “Herin, we di rojekê de çiqas erd ajot, bila ew ji we re be.” Keçik diçê ji mîrê xwe re dibêje. Li ser vê gotinê zilam dest bi cot dike û hemû cihê xezûr xwe di nava nîv rojê de diajo. Şêxhesen dimêzîne ku tiştek ji wî re nema; êdî li ser vê soza xwe dev ji cihê xwe berdide tê Gundê Bodikê. Ji vê eşîrê niha li gelek cihê din hene. Mînak: Malbata Doxan Dede (İzettin Doğan) jî, ji Eşîra Şêxamed e.

We, Seyid Riza kengê û çawa nas kir?


— Ez, Seyid Riza ta ji zaroktiya xwe ve nas dikim. Ji min gelek sal mezintir bû. Ew tevahî çar bira bûn, Seyid Riza birayê navîn bû. Navê birayên wî; Axa, Xidir û Keko bûn.

We gava din der heqê Şerê Gerdûnê yê Yekemîn û berxwedana gelên Dêr-sim de hin tiş anîn ziman. Hûn dikarin ji kerema xwe re ji me re hinek agahi-yen din bînin zimên. Di wê demê de te-sîra Seyid Riza pir bû an na?

— Belê. Tesîr çawa tune? Ma ew serokê wê hereketê bû. Me qol avêt (girtina ser) ser leşkerên ûris, li Çiyayê Mîzûr. Di vê bûyerê de pêşî me nobedarén wan kuştin; pişt re jî em qelibîn nava leşkerên dijmin. Vê demê wan xwe şashkirin. Yênu ku hatin kuştin jixwe mirin, lê belê yênu ku nehatin kuştin jî reviyan. Tenê çekêni di destê xwe de xelas kirin, ên din gişt li wir hiştin.

Me jî ew gişt bi dest xistin. Di wê zivastana reş de me bi piranî bi zikê birçî şer dikir. Lewre di vî şerî de me gelek nanîn somî (somin) û xwarinîn din bi dest xist; li xwarinê jî me mirazê xwe kir. Hevalê min Mistê Çêl, ji konêñ ûris jî xwe re şalwar durût û bi vî şalwarî di nav gel de bû navdar.

Dema ku em ketin Erzinganê, me dît ku ûris bi kesekî tiştek nekiriye. Tu car leşkerê wan bi xweser nediketin nav



gundan. Lê belê fileh (ermen) ên ku di nav leşkerên ûris de ne, wan gelek zilmû zor kirine. Pir kes kuştine, bi bizmaran jîn, zarok kuştine. Kesén ku hatine kuştin hem tirk, hem jî kurd in.

We hereket heya ku derê domand?

— Seyid Riza ku ji Erziromê zivirî hat li Erzinganê wekî walî li wir ma. Pişt re xeber şand û got: “Besa keça alîkarî dikir.

Lê belê Seyid Riza xwendî jîn bû û jîna wî jî keça Diyap Axa bû; ji wê jî çar lawîn wî hebûn. Dema ku Besê çû cem wî, Seyid Riza ew li xwe mar kir û dev ji jîna xwe ya berê berda. Seyid Riza di destê Besê de gelek zirav bû û tu caran qeziya wê nedifirand (neşikand). Jê pir hez dikir; xwarin û vexwarina wî hemû bi destê Besê dihat çêkirin. Seyid Riza

**Seyid Riza ne kesekî ji rîzê bû; ew zilamekî taybet bû.
Ji ber ku di Şerê Gerdûnê yê Yekemîn de dema leşkerên tirk
ji ber artêşa rûs direviyan wî bi serê xwe bi wan re şer kir
û ew bi şûn de vegerandin. Lê, berî ku wî bi dar ve bikin,
ji bo ku janeke mezin bidinê pêşî kurê wî Husênê Reşik li
ber çavên wî avêtin darê.**

(qîza) Memê Gox ji min re bisînin. Ji bo xizmeta min bila were vir”.

*Der heqê Besê de zêde agahî nîn e;
hûn dikarin ci bîbêjin ?*

— Besê ji bo min keseke nenas nebû. Dema ku Seyid Riza daxwaza Besê kîribû, wê dev ji mîrê xwe Alê Gop (ji gundê Axdadê) berdabû û di mala bavê xwe de bû. Ew jineke bî bû. Bi rastî min hezkirineke wisa nedîtibû. Ew hezkirin tu caran ji jîna xwe ya mezin re nîşan nedida.

Seyid Riza gelek car ji Besê re tişteñ xweşik dianîn, ji me re mînakek da ku di vî warî de gelek balkêş e. Digot: “Jîna mirov mîna mangeyeke şîrî ye; gava ku hûn wê baş xwendî bikin û dile wê jî xweş bigirin, ew jî wê şirekî zehf bide. Ji ber vê yekê lazim e ku tu jî dilê jîna xwe xweş bigirî û dilê wê jî te nemîne.”

*Zarokên Seyid Riza ji Besê çêbûn
çênebûn?*

— Ji Besê 5 an jî 6 zarokên wî çêbûn, lê belê her hal ji xeynî Leylayê hemû di şikestina serhildanê de mirin. Dema ku serhildan şikest, Seyid Riza û em mahiyetîn wî bi hev re çun li malbata xwe re zehf

herî bilind; li Mezra Balî, me querergeha xwe amade kir. Seyid Riza li wir bi destê xwe qaryoleyek amade kir ji daran. Pir jêhatî bû. Tu tişt ji desten wî xelas nedibû. Gava yekî bigota ji min re ev tişt lazim e; Seyid Riza hacetê xwe digirt û ev tişt amade dikir. Heta tembûr jî çêkiribû. Bi kurtasî wan rojan li nav gelê me ci dihate bikaranîn, wî dikaribû ew çêbikira.

Li ser kurê wî, bawa hûn ci dizanîn?

— Kurê Seyid Riza Bawa, di nav malbatê de cihekî taybet digirt. Ji ber ku ew hem xurt, hem jî zana bû. Kuştina wî wiha çêbûbû: Bawa zewicibû, lê demekî bi şûn de wî û jîna xwe dev ji hev berdan. Ji ber vê yekê pîreka wî zivîrî çû mala bavê xwe. Lê çiqas wext derbas bû nizanim, her hal Bawa tiştek bihîst der heqê pîreka xwe ya bî û tekiliya pismamî xwe Rayber (Rêber) de; li ser vê agahiye gelek qeherî û li ser tişten ku bihîstîn xwest ku Rayber ceza bike. Lê belê Rayber bi vê dawxaziye hesiya û berî wî, ew kuşt.

*Hûn di nav hevalê Seyid Riza de kî
ji bîr nakin?*

— Yek kesek heye ku tu car ez ji bîr nakim. Ew ne mimkun e. Ev zilam kesekî taybet bû. Navê wî Rizayê Tilegê bû. Rizayê Tilegê hevalê Seyid Riza bû. Dema ku serhildan şikest, dîsa jî ew dostê wî yê herî sadiq bû. Ji ber wê yekê jî wî, ew berneda. Wê demê imkana wan di mabûna malan de nemabû. Li ser vê rewse êdî ew li şikeftan diman. Tu xwarina wan tune bû û ew bi piranî birçî diman. Rizayê Tilegê di van rojan de dadiket nav gundan û ji gundiyan qawût û tişten wekî din dixwest û dibir.

Seyid Riza çawa hat girtin?

— Hêviyên Seyid Riza ku êdî winda dîbin; dibêje ezê herim Erzinganê teslim bibim. Gava ku bîryara xwe standîye bi awayekî veşartî, wekî tebdîli qiyafet tevî hevalekî xwe dikeve rî û diçê aliye Erzinganê. Ü diçê pira ser Çemîmê Feradê, lê belê li wir qontrola leşkeren tirk heye. Li wir xwe eşkere dike.

Li ser vê yekê, ew dixwaze ku xebêre ji walî re bişînin. Èdî leşker li hev dijerin. Di demeke kurt de walî bi xwe tê wî digire û dibe qonaxa xwe, cihekî taybet jê re amade dike. Bi vî awayî pênc rojan dike mîvan. Pişt re jî haya wilayeta Xarpitê pê dixe. Belê êdî bi lez û bezî Seyid Riza birin Xarpitê. Jix-we Erzinganê bi awayekî giredayî bajara Xarpitê bû.

Abdullah Alpdoğan bi lez û bez Seyid Riza anî Xarpitê. Di pey re jî (li ser emrê Enquerê) wekî dozeke komedî lê hate vekirin û di 10'ê sermawenza 1937'an de bîryar girtin ku Seyid Riza bê bidarvekirin. Di şikestina vê serhildanê de Seyid Riza û lawê wî yê biçük Husênê Reşik, bi tevî 11 hevalê wî bi hev re li navenda bajarê Xarpitê, li Meydana Genim di rojekê behnvedanê (tatil) de hatin bidarvekirin. Ji bo ku Janeke mezin bidin Seyid Riza; kurê wî li ber çavên wî avêtin sêdarê.

Neteweyêñ Yekgirtî

- 1 -

Ji mêj ve, ji mêj ve
Ji berî pêncî salî ve
çend xincer
di xaka Kurdistanê de
hatine cikandin?
Bi mayîn û têldirî
hatine pêçan?
Xal ji xwarzê
ap ji birazî
hatine qetandin.
Kul, êş û jan
belav bûye
Li Kurdistanê?

- 2 -

Ji pêncî salî ve
Neteweyêñ Yekgirtî
bûye sazûman
ji bo parastina
mafîn mirovan
dermankirina
êş û janêñ gelan
xweşî û geşîya
neteweyêñ cihan,
lê mixabin û sed mixabin

ku carekê tenê
negeryaye li mafîn kurdan,
carekê tenê
ji gelê kurd re nebûye derman.
Û her û her
gelê kurd di bin zilm û zorê de
maye tewyayî,
di bin hêza karbidestan de
maye destgirêdayî
Ji zimanê dê û bav
bêparmâyî

- 3 -

Ev pêncî sal e
Neteweyêñ Yekgirtî (UN)
bûye hîmdar
bi UNESCO
UNICEF û Lahey
bi kar û bar.
Li ser çêlekên Hindistanê
dixeyide
li ser qertel û qirakên Afrikayê
diengire,
li kuçeyên şûnewarê kevn
dibe xwedî û dikire
rojekê negotiye

sih cil milyon kurd
di hejarî û bindestiyê de
dimire...

- 4 -

Ev pêncî sal e
û ji berî pêncî salî ve
kêr li ser stûyê
mirovêñ kurd hatiye danîn,
dar û daristanê Kurdistanê
tê sotin û birîn,
pêmayêñ bav û kalan
li ber talanê
tê dizîn
û mirovêñ kurd newêrin
bi zimanê bav û kalêñ xwe
bikin girîn
û hêj carekê tenê
Neteweyêñ Yekgirtî
nekiriye gazi û qirîn;
Ka Dadgeha Lahey
û mafîn mirovan,
ka UNESCO û
parastina zimanê gelan,
ka UNICEF û
guhdana zarokêñ kurdan!?

Nizanim!
Çi di vê bîranîna pêncî salî de
Ji Neteweyêñ Yekgirtî re
diyar bikim?

Gelo!
qerpalê şehîdeki bixwîn
ji Senendac, Agirî, Şernex
û Dêrsim...
kuç û qehfîkin kurdistanî
ji entikxaneyêñ Parîs, Berlin
û London...
hestiyê zarokekî kurd
ku ji nêz û éshan miriye
li deşta Hewlêr û Silîvan
wêneyêñ çend gundêñ
kavîl û wêran
ji bakurê Kurdistan an
cizmeke bixwîn
ji cizmeyêñ leşkerê
karbidestan
û pêncî singêñ bixwîn
û têldirî ji xaka
Kurdistan !?

KONÊ REŞ

Zarok

Destêñ te
porê te
cilén te
reş in.
Xem nîn e.
Çavêñ te behr
awirêñ te roj
dilê te vekiriye
ji ronahiyê re
bes e.

Evîn Welat

Ez li gund û bajar
navçe û qezayan geriyam
carinan mam birçî
carinan bûm xwedî nan.
Min ji hinekan hez kir
û ji min hat hezkirin
carinan bejnzirav
carinan pozdirêj
wan ez ji bîr kirim
min ji ew.

Lê te
mîna siyê
dev ji min berneda
min ji dev ji te.
Axîna min
parçeyek ji laşê min
evîna welat.

Name

Name têñ ji me re
nameyêñ ku li ser "hatine dîtin" nivîsî.
Germ dikin dilê me
sahî dikin mala me
hêzê didin jiyana me.
Name diçin ji me
ji menzelén bêsewax û biçûk
bi evîn hatine nivîsandin
bi hesret
da xurt bibe berxwedan
da ges bibin gulêñ Kurdistan.

Qoriciyêñ gundan

Çavêñ we hatiye girêdan bi meqam
û peran
Hûn ber lingêñ xwe nabînin tu caran
Naxwazan hûn kirine serxwes
Ya eniya we yê li zinaran keve, ya
hûnê noq bin çalan

Ey emirberên neyaran
Li pişt we dimeşînîn êrîşkaran
Ji bona havilek gengaz
Hûn bûne qoriciyêñ gundan

Her der li we bûye tarî, hûn
bûne uryan
Hûn ji hev naqetînîn yar û neyaran
Hişyar bin li dor xwe mêze bikin
Her der azad bûye bê xaka

Kurdistan

Di ber we ji gelek bêmêjî kirkibûn
qehremen
Gava ku neyar bi ser diket bêaman
Çi dabûne wan pê didan verişandin
Paşıya we ji ya surgûn e,
ya qewitandin e
qoriciyêñ gundêñ

Hûn hatine xapandin bi gotinan
Hûn vedixwin xwîna pismam û biran
Dûr û nêzîk hûnê ji poşman bibin
Wekî tajiyê nêçîrvanan

Hûn bindest mezin bûne bi salan
Li ber çavêñ we jin û zarok,
kesen bawer têne kutan
Hilweşin, bibînin riya rast
Hûn ji xwe bidin ser aliye pismam
û biran

İro pişta we tê tevdan
Sibe hûnê ji bixwin pehin û
qamciyan
Ji bona havila xwe mebin bindest
Hişyar bin, hûn ji bixebeitin ji bona
xelasîya Kurdistan

Kesên li dor me rewşa wekî hev
Gelek car serî didin ber hev
Naxwazin em pêşve herin
Êrişî Kurdistanê dîkin tev

Dubendîtiyê dixin nava Kurdistan
Yasax kirine xwendin û dibistan
Naxwazin kurd bibin zana
Tuneyî ji kurdan re kirine destan

Ey qoriciyêñ bêbext!
Ji dayîna cînarân çenabê tac û text
Ji wan re rêberiyê mekin
Di destêñ wan de tiving li pişta
wan rext

Dixwaze li serê çiya, dixwaze li gund
Gava kurd têne kuştin serê wan
dibe bilind

Ne xatirê gundiyan li ba wan heye,
ne yê qoriciyan
Gelekî şâ dibin këfa wan dibe rind

Vê sondê qet ji bîr mekin ji bona
geli dostan
Leca mezin ji we re bi zimanê xwe
xwendin û dibistan
Bi şev û roj li her derê bixwazin
Xelasîya kurd û pêşveçûna

Kurdistan.
NURETTİN KARACADAĞ

Barûyêñ Amedê keresî

Dîsa bîhar e
li perava Dîcleyê
komek zarok
bi benêñ rengîn li benda qirnan in
Her dilek li wan
bi qasî barûyêñ Amedê şîdyayî ye
Her telşike li lingêñ wan
bi qasî dîliyê reş û bi jan e

Roj ber bi ava ye
Seyrantepe di keresiyê de ye
Refeke kewan fîriya
ber bi belekiyêñ berfê ve

Dîcleyê bi awayê dengbêjiyê got
Zarakan girtin dîlan
Ne bilür, def û zirne
Ne ji tembûr heye.

JEHAT GIMGIM

Dergûşa dilpakiyê tu yî
Mij û moran radibe
ji ser asûmanê te
axa te bi xêr û ber dibe
fekî û hêşinahiyêñ te namînîn êdî
di bin potînîn biyanan de
emê bi te şâ bin
bê çawa zarok bi şîmamokan
şâ dibin
Cotkar dê bextiyar bajon
zêviyêñ xwe
dapîr dê kêfxweş birêsin teşîya xwe
Karker û xwendekar serbilind
ronakbîr dê serbest bimeşin
di nav baxçê roniye de...
Welatê min
me ji memikê te mêtîye
sebra Eyûb
li ser singa te şîn bûye şarezayî
û dergûşa dilpakiyê tu yî..

HESEN ZINAR



Navenda Çanda Mezopotamyayê ji bo afirandina berhemên nû yên çand û hunera kurdî hin çalakîyan pêk tîne. Li hêlekê panelen li ser çanda kurdî, li aliye pêşkêşkirina konser û şanoyan bala pir mirovan kişande ser xebatên NÇM'ê. Wekî her car eleqeya pêşîn hézên dewletê nişan didin. Lî ji bilî van jî gelek bi niyeteke baş, dixwazin çand û hunera kurdî ji nêzîk ve nas bikin. Yek ji wan jî hunermendê tîr Şener Şen e ku ji saziyê ji bo ferbûna zimanê kurdî alîkarî xwestiye û daxwaz kiriye ku hunermendê NÇM'ê di filman de alîkariya wî bikin.

• **3.7.1996 Çarşem:** Li ser qetîfama Sêwazê panel, Réveber Ercan Kanar,

kesen ku wekî axaftvan besdar dibin: Mehmet Metiner, Lütfü Kaleli, Hüseyin Karataş, saat: 18.00

• **5.7.1996 În:** Beşa Hunerên Dîbâriyê yê NÇM'ê filmê Vaadler Ülkesi (Welatê wadan); derhêner Andrej Wajda, saat: 18.00,

6.7.1996 Şemî: Li ser şîrî sohbet û guhdariya şîran, pêşkêşyan Suna Aras, saat: 16.00, Teatra Raperîn, İstîka Öç (tol) niyîskar Orhan Asena, saat: 18.00

Li Zanîngeha Azad jî vê heftiyê panelek heye.

• **4.7.1996 Pêngem:** Li ser "Di dema nêzîk de li Tirkîyê jiyana siyasi", axaftvan Özlem Özgür, saat: 18.00

RÛDAN

Faik Bucak: Sonda mirinê dabû...

Axa û beg di xema mal û milkê xwe de bûn. Lî Faik Bucak her çendî têkoşîna vê yekê jî bida, têkoşîna wî ya esasî neteweyî bû...

Rewşenbir û siyasetvanê kurd i navdar Faik Bucak di 4'ê tîrmeha sala 1966'an de li Ruhayê, li herêma Qerekopriyê hate kuştin... Faik Bucak hê di dema xwendekariya xwe de dest bi siyasetê dike. Li Stenbolê dema di Fakulteya Hiqûqê de dixwîne, ew û Musa Anter û tevî hinek hevalên xwe di sala 1939'an de ji bo xwendekarênen kurdan, di 21'ê adarê yanê roja Newrozê de "Dicle Talebe Yurdu" dadimezirînin. Di salvegera yurdê de Newrozê jî pîroz dikan.

Ev yurd ji hemû xwendekarênen kurdan re dibe war.

Bucak ji aliye kî ve rîveberiya yurdê dike, ji aliye din ve jî xortênen kurdan di bin komên folklorê de li hev dicivîne. Li Halkeviya Cağaloğluji her herêma Kurdistanê şeweyenê govendê pêşkêş dikan.

Dostê wî yê herî nêzîk Musa Anter e. Bi hev re şevan çedîkin. Ji ber ku di wê demê de ji xeynî "Dicle Talebe Yurdu" yurd tune ye, gelek kesen navdar besdarî şevêwan dibin.

Hêj di dema xwendekariya xwe de, mafê şêx, axa û begênu ku ji aliye dewletê ve hatine sirgûnkirin diparêze. Di bin serokatiya Nuri Demirag de partiyek bi navê "Millî Kalkınma Partisi" tê damezirandin. Ev partî mûhafazekar e, lê li dijî rejimê mûhalefetê dike.

Piştî ku tehsîla xwe diqedîne demekê li Hatay, Kozan û Zarayê dadgeriyê (hakimî) dike. Pişt re vî pişeyî berdide, vedigere welat, ji aliye kî ve li Ruhayê parêzeriyê (ebûqatî) dike, ji aliye din ve kar û xebata siyasi dike.

Di sala 1960'an de ku darbe çêdibe, ji kîfan xwe ji balkona malê diavêje, piyê wî dişkê, lê darbevan wî jî bi 54 axa, beg û şêxên kurdan re sirgûnî Sêwazê dikan. Piştî ku sirgûn védigerine welat jî, destûra Faik Bucak nadin, wî ji kampa Sêwazê rîdikin Enqereyê. Heta destûra vegera welat didinê, demekê jî li wir dimîne.

Pişt re bi hinek hevalên xwe re partiya PDK'ê ava dike. Çawa ku Tarık Ziye Ekinçi dibêje, hêj di xwendekariya xwe de tim dibêje "ji me re partiyek, rîexistinek lazim e."



Di sala 1965'an de ji bo hilbijartinan di partiya AP'yê de hilbijartina ji bo berendamîtiyê qezenc dike, lê navenda partiyê ditirse, wî qebûl nake. Ew jî serbixwe tevî hilbijartinan dibe.


Li ser hilbijartinan jî, Tarık Ziye Ekinci wiha dibêje: "Wê demê min di Partiya Karokeran (İşçi Partisi) de xebat dikir. Ez cûm cem wî; min jê re got, were di partiya me de bibe berendam, qebûl nekir, bi serê xwe tevî hilbijartînê bû. Berendamê me bi şes hezar ray bû mîbûs, lê ji ber ku ew serbixwe bû, tevî ku 16 hezar ray stand jî, nebû mîbûs. Piştî hilbijartinan gotibû, xwezî min bi xebera Tarık Ziye bikira..."

Faik Bucak di 4'ê tîrmeha sala 1966'an de li Ruhayê, li herêma Qerekopriyê di kemînekê de hate kuştin. Çawa tê zanîn, MİT'ê ew kuştîye.

Bucak şîr jî dinivîsandin. Di şîreke xwe de, "Sonda me mirin e di riya te de welat / Kefen kirâse me, ferman jî xeml û xelat" nîvisandiye û bî vî rengî di riya welatê xwe de çû..."

RAHMÎ BATUR

TÎŞK



LERZAN JANDÎL

Di domanên tîrkan

Sebeta ke ma bişikîme qedr û qîmetê perwerdekerdena ma û piyî, ê çêyî û bado jî ê medya rind biyârîme re zon, wazenîmê naye ebi 2 mînakan (mîşalan), ebi di domanân tîrkan bikerîme.

Mînakê jûyîne, jû çeneke de tîrka new serî ya. Rojê ez goş nana kase-ta Rençberî ser. Na çeneke amê lewê mi, persê:

"No kamo vano û ebi kamcî zon vano."

Mi jî va: "Namê nê hunermendî Rençber o û ebi kirmancî, ebi zonê/zarava mi vano."

Na çeneke zaf biyê şâ û wayşt ke ez nê kilaman dayê musnê. Eke mi ci ra va: "Hama nê tîrkî niyê, zonê ma nê." Va ke: "Ma qe zonê şima bê, tayîna rind. Hem muzîkê xo weş o, hem jî hunermend zaf weş vano."

Rojê de bîne wunciya na çeneke pirtûkên/kitabên "Wendene Roşti ya" û "Binivisne! Niyade! Birengel!" dî. Mi ra va ke: "Nê pirtûkê çinay ê?" Mi ke va: "Ê zonê ma nê." Va: "Ez peranê to dana, to bide mi. Ez wazena zonê şima jî bimusê." Nayê ser ro mi va: "Ma piyê to hêrs nêbenê?" Va ke: "Çiyo henê beno, ê jî benê kêt weş."

Mînakê didîne, jû layikêde tîrkî yo des serî yo. Nê layikî ez MED-TV de diya, ke rojê mi ra persa: "Ti kirmanc/kürt a?" Mi va: "Hêya ez kirmanc a." Nayê ser ra persa didîne amê û pirsa: "Ma to alevî ya jî?" Mi jî ci ra va ke: "Hêya ez hem kirmanc a û hem jî alevî ya. Ma ti?"

Na persa min ser ro nê layikî kayê xo ca verda, vindet binê çiman ra mi de ebi xişm niya da û va: "Ez tawa hêni asena?"

Hêya, "Ti tawa hêni asena?" Qey ti vana "des goşen kirmancan, çar çimên dînan" estê?

Çi ra? Areste/zelal o. Domanî ci heşna, ci dî, ci musa ê pêyser dano. Ma û piyê domanî ke domanî ebi şoveniye, ebi dişmeniya kirmancan û aleviyan, ebi vergeraran perwerde kerê, doman jî beno şoven, beno dişmenî kirmancan û aleviyan. Heşê domanî de wêneyêde (resmî) kurdan û aleviyan wirazîno, ke kam zano "goşen xo, çimên xo, lew û pirnikên xo senen ê"? Kam ci zano; "doçikê xo esto çîno?", mordemî wenê, nawenê"? Nê persî şîkînê derg bê. La belê bes ê.

Nê mînakê corêni perwerdekerdena domanan de rolê ma û piyî, medya gelê areste musnenê. Doman kamcî şarî ra beno wa bibo, hem şîkîno dostê şarî de, kulturêde bîn bo, yan jî dişmen bö.

Sebebê nayê bêguman verde ma û pî yanê çê domanî, bado jî medya ke doman goş nano ser yan jî waneno, wa. Xêlê ma piyê tîrkî, medya tîrkan hemverê kirmanc û kirmanciye, hemverê kes û kulturanê bînan domanan xo ko kar, bêfîkir û ebi vergeraran kenê pîl. Nê domanên ke niya amê pîlkerdene, meystê benê bîlâyê şarî ma, bîlâyê sarê kedkaran. Her ca de bêtoleransî ye, jar, dişmentî ye, şer û kîstene ramenê.

Na derheq de karê roşanbîrânê tîrkan gelê giran o. Hemverê na perwerdekerdena bêheşe, kore ganî tîrk û kirmancî ha warê şexsî de, ha warê medya de dest bi şerê/karârî roşîkerdene bikerê.

Her çığa ke, no xebat zor o jî, roja amayene de garantiyê tîlewede vindetene, biratî û hevaltiye, teyna no kar xo wo.

Rehîmê kinc dişüştin. Roja inê roja beravê (kincşûtinê) bû li mala Hecî. Ji serê sibê, heya êvarî bi vî karê giran mijûl bû. Pirr westiya bû. West, west, west... Jixwe her roj tişte bi dest diket tenê ev bû. Li mal şixul, li derve şixul. Hema karê malê dihat kişandin. Çawa bûya yê kuflâtê wê bûn. Jixwe van jî tiştek zêde nedigirtin. Lê ev karêni li ber malan, di bin emrê xelqê de ... Ax, van ew ji dest û ling dikirin.

– Rehîme, wekî te şuxilê xwe qedand were, işê min bi te heye.

Dengê xanima malê bû.

– Bila Nezaket xanim, ser serê xwe!

Xanim bi xwe ji ber sobê ranedibû. Di vê sermê de ya dest û tilî diqefîlandin her ew rebena Rehîme bû. “Ka wê çi bêje” Nezaket xanimê ji bo gotina xwe be jî tenezil nedikir derkeve hewşê. Ji bo axaftina xanimokê jî di-viyabû ew biçuya ber piyên wê. Mîratê, kincen wan jî hinde zehf bûn, bişû, bişû naqedin. 10–12 kiflet, her yekî jî, ji deh qatan bêhtir cilên wan hebûn. Wekî bi ser vî karî keti bânga mexrebê dida. Dûv re jî raxistin, arav rijandin. Dest û rûyê xwe şûştin, serûberê xwe rast kir, çû ber deriyê xanîmê:

– Nezaket xanim, te gotibû were işê min bi te heye. Kerem bike.

– Erê, te cil hemû raxistin?

– Belê.

Nezaket xanim hat ber devê derî, derî vekir:

– Ha ji te re van du sed hezaran bigire. Ev destheqîya van cilikan e, li ber deriyê metbexê jî hinek pantor û gomlekên kevin hene. Min ew ji bo te danîne. Wan jî bibe ji zarokên xwe re. Tu zanî, sibe divê em malê jî li hev bidin. Mehîfîr (xalîce) û merşikên me gelek lewîfîne. Hêj Hacî ji Enqere nehatî divê em paqîjiyekê bikin. Şevê dî (din) telefon kir, dusibe-sesibe wê bê malê.

– Ser serê min. Xwedê ji te û Hacî razî. Ezê sibehî zû li vir bim. De malî ava:

– Xêr û silamet, ji bîr neke ha! sibî zû.

Rehîm derket. Çend kevneparçen pantor û gomlek û qazaxên ji ber zarokên malê mayî, dan ber paşila xwe û lê da çû malê.

Çar zarokên Rehîme hebûn. Ev serê 7–8 mehan bûn hatibûn bajêr. Li dor kaniya Qesaran ji xwe re xaniyek girtibûn. Zikekî têr, çar zik birçî, serê xwe datanîn. Zarokên wê hîn biçûk bûn. Lê welê jî bi wan re zêde imjûl nedibû. Siharan zû ew dihiştin, diçû bi karêna bâjariyan diket. Li wê malê, li vê malê, dixebeitî heya êvarî. Ji bo çend qurişan, da zikê wan têr bibe.

Malxwê malê ev du sal tunebû, di hepsê de bû li Amedê. Rojekê hêzén dewletê di ser gundê wan de girtibûn, li wir di navbera wan û gerîlayan de pevçûnek mezin çebûbû. Dûv re eskeran tevî mîrê Rehîme Gurî, 10–15 gundî jî girtin, di gel xwe birin. Du sê mehan tu agahî ji wan derneket. Herkesî digot kuştine, avêtine deverinan.

Piştî demeke dirêj, salixdanên wan jî Zindana Amedê standin. Gurî.. ji wan

Berdestî

Ezê ji Rehîme re meselê bibêjim. Ewê jî dê xeber bide wan.

Ew li hemberî tiştên pîs: Kûmarê, faîzê û hîleyan in.

Ji tiştên halo pir aciz in. Çawa cewab bigihîne wan, ewê di cih de dest deynin ser vê meselê. Wê tirsekê bidin

Meco û tu jî seyra Meco bike wê çaxê

re xeber şand, got: “Bila dev ji gund berdin, herin Cizîrê. Tiyyê Rehîmê. Hesin jî berî salekê çûbû li wir bi cih bûbû. Wan jî bar kir, çûn Cizîrê. Dema di ser gund de girtin, piştî pevcûnên mezin, ci xorten Gund hebûn ji gund bazabûn, tevî rîzân gerîlayan bûbûn. La-wê Rehîmê Rêzan wilo derketibû ciyê, bûbû gerîla. Piştî vê bûyerê Gund vala bû, dewletê tiştên malîn jî birin û Gund şewitandin.

Roj li pey hev dîborîn. Rehîmê bi vî awayî jiyanâ xwe didomand û aşê mal-bata xwe ya peregende digerand. Hinek li ciyê, hinek li zindanê, tişte ji ber mayî jî li vir, li derbederiye. Di van hoyan (sert) de Rehîma reben, bi şev û bi roj dixebeitî, ci kar li ber biketa, dikir. Kufletê xwe xwedî dikir, pere ji Gurî re dişandin; carina diçû dîtina wî jî. Di nav karêna ber mala xelqê de, para mezin karêna mala Hacî Xêredin bû. Bûbû berdestiya wan a sereke. Hacî Xêredin ye-kî halxweş bû. Di zemanê xwe de bavê wî pêşhatiyekî bajêr bû. Lê vê paşiyê hinekî desteng bûbû. Çimkî du caran xwe di ber reîstiya bajêr re kiribû. Hey-yî-neyiya xwe tev de li ser vê dabû, lê bi ser neketibû. Vêca îsal jî xwe di ber hilbijartina parlamanê re kiribû. Hilbijartina mebûstiyê jî winda kiribû. Di vê hilbijartîne de ji bilî partiya HEP’ê (Partiya Keda Gel) tu berendamên partiyen din derneketibûn. Ji Şîrnexê her sê parlementerên derketin, ji vê partiyê bûn. Rewşa wî ya aborî pir teng bû, ji ber vê yekê. Hêj Gund û erdêne wî diman, lê belê piştî rabûna partiyê ya 84’an, gundî jî şiyar bûbûn, tu menfa-eteke berketî ji gund nedihat edî. Gundiyen hîn diçû, dengê xwe li pêşberî wî bilindir dikirin. Ji xwe nêzîkî 30 xor-tên wan jî ketibûn nav refen gerîla.

Hacî Xêredin ji ber destengiya xwe çûbû bi faîzê pere standibûn. Peren bi faîzê standin, hingî dibû, li ser girtan dibûn. Mecoyê Simo her roj dihat peren xwe û faîza wan dixwest. Dihat, diçû, lawê xwe dişand malê. Li sükê, li kuçe-yan, li ku derê Hacî bigirta, dest bi giri-gire dikir. Hacî ji ber bela wî û şerm-ezariya halê xwe bi rojan dervediket derved, diçû bi mehan xwe berdida En-qereyê.

Vê carê jî Meco dest bi telefonan dikir, şev û roj telefon dikirin, mejiyê se-re wî dixwar. Rojekê rûniştin hesabê. Meco hesabek wilô jê re derxist ku stri-hen wî pê derkevin. Heke, Meco çar-dabûnê, cil jê dixwestin. Li ser hesaba her meh faîz ji sedî deh, bênavbir di se-re wî de dixura, mejiyê wî reş dikir, vê paşiyê jî dest bi tehdîtan kiribû. Rojekê

Meco careke din telefon da:

- Hecî.
- Hey libê!
- Ez Mecîd.
- Bêje Mecîd
- Te ci kir?

– Mecîd ez li bextê te me. Xwe hine-kî din jî li min ragire. Ma qey ez revi-yame lawo?

– Hih, hiih, ê belkî jî tu birevî, ma ez ci zanim. Ji te re mûhleta dawî. Tu ci bikî bike, di zerfê du rojan de vî işî hel bike. Perokên me bide me. Ma ne min qencya xwe bi te kiriye. Ez jî niha di tengiyê de me. Ma tu ji qencye fîmnakî kuro? Hey haciyê ne hacî:

– Mecîd, welê gotinên girtan nebêje!

– Wele ezê bêjîm û hê jî bêhtir? Ji te re du roj. Vêca tu zêrên Nezaket Xani-mê difiroşî, xaniyê xwe diavêjî mezadê, yan Nezaket Xanimê bi xwe difiroşî, ez nizanîm. Edî ez hew li te digerim, gora wê tedbîra xwe bistîne, du roj ha!

Meco telefon danî. Hecî ev heqare-tên wiha tu carî nedîtitibûn. Kete nav ja-neke girtan. Meco ne yekî wilô ye ku ji peyvan jî fêhm bike. Her tişt jê tê. We-le dikane dest deyne ser Nezaket Xani-mê jî, wê bibe bifiroşe. Xaniyê wan ba-vêye mezadê, bi darê zorê tapuya wan ji wan bistîne.

Hecî ji, Nezaket Xanim jî ketibûn nav tayeqe tîrsê. Şaş mabûn, ditirsiyan, nedizanîn ci bikin. Ji nişka ve wekî ci-rûskekê fikrek di serê Nezaket de vexu-ya. Berê xwe da mîrê xwe:

– Hecî!

Piştî demekê ançax bersiv ji Hacî hat:

- He!
- Ji vê bîlâyê re çareyek hate bîra min.

Hecî bîdil jê pirsî:

- Ci çare?
- Tu dizanî? Ya vî işî bikane hel bi-ke, inçex û inçex Rehîmê be.
- Rehîme? Rehîme kî ye?
- Ev berdestiya me lawo.
- Çawa?
- Rehîme jî ji vanen derve ye, ma tu nizanî?

– Yêne derve?

– Erê lawo, ango partî. Ew jî, mîrê wê jî, kurên wê jî tev de “heval” in.

– Ne lê? Èêê?

– Ezê ji Rehîmê re meselê bibêjim. Ewê jî dê xeber bide wan. Ew li hemberî tiştên pîs: Kûmarê, faîzê û hîleyan in. Ji tiştên halo pir aciz in. Çawa cewab bigihîne wan, ewê di cih de dest deynin ser vê meselê. Wê tirsekê bidin

Meco û tu jî seyra Meco bike wê çaxê

– Tu rastî dibêjî?

– Erê wele. Ma qey tu bawer nakî?

– Baş e. De ka bangî Rehîmê bike, jê re bibêje.

Nezaket Xanim û Hacî bangî Rehîmê kirin. Derdê xwe jê re gotin. Wê jî ev bûyer gihad hevalan. Wan dest avêtin vê gelemseyê. Meco tırsiya, dev ji hesaba xwe ya faîzê berda. Hema te-nê peren ku bi deyn dabû Hacî Xêredin qâl bû. Nezaket Xanim du-sê bazinê xwe firotin, dan Meco û ji vê bîlâyê rizgar bûn.

Ji wê rojê pê ve li mala Hacî Xêredin û ser tevî re qedrê Rehîmê bilindir bûbû. Carcaran Hecî pîrsa halê wê, yê mîrê wê û zarokên wê dikir. Lê ji bîlî vê tiştekî din nehatibû guhartin. Tenê nedîhiştin ku here maline din, bûbû para wan tenê, berdestiya mala wan tenê. Dîsa eynî kar dikirin, dîsa serê sibehan (siban) zû dihat, fîraq-mîraqen wan tev dişüştin, paqîjiya hundîre malê, ya hewşê, heya ber devê derî û derveyî derî dikir. Nezaket Xanim û Hecî pesnê xwe bi wê didan, ango Rehîme heval e û ew jî wilô qenc in û wilô jî aliyê hevalan in ku wê li ba xwe bi berdestîsi didin xebitandin. Vê “minet” a mezin li hevalan dikin. Ci dema çela (behsa) hevalanbihata kirin, wekî ku xwe ji wan (!) bihejmîrin (hesab bikin) xwe piş di-kirin. Carinan heval bangî mala xwe di-kirin, diezimandin, xwarin ji wan re çê-dikirin û wê şevê li ba xwe radizandin, bi vî awayî “ewleyî” ya xwe li ba wan qewin dikirin.

Rojen xweş derbas bûbûn. Dawiya sala 1993’yan rewşa hevalan hinekî qels ketibû li bajêr. Her roj hinek ji wan û ji alîgirêwan, dihatin girtin, dihatin kuştin. Dewletê pêkûti û tundiyen xwe pir zêde kirin, bajar di nav xwîn û agîri de hiştin. Bi darê zorê sercerdevan (Korucîbaş) Kemoyê Teyî kirin reisê bajêr. Heval bi taktikî ji nava bajêr ve-kişyan. Bajariyan bi piraniyeke %60–70’yi ji bajêr koçkirin. Èn çûyîn bajarine din li aliyê rojavaya Tirkîye, yê çûyîn Amed û Mêrdin û Rihayê. Èn derbas bû, çûn Başûr, an derketin serê çiyan...

Şevekê di ser mala Rehîmê de girtin. Ji sedan pîrtir leşker û tîm û korucû bûn. Hêj li malê, li Rehîmê û zarokên wê dan, Rehîme di erdê re kişkişandin, bi kulm û pehîn û hincikan li panzerî si-war kirin, birin. Tawanê (sûc) wê alîgî-riya hevalan bû. Wê ev inkar dikir. Ci-qas işkence lê kirin, nekanîn pê bidin qebûlkirin. Rojekê Hecî Xêredin derxistin pêşberî wê. Wê çaxê Rehîme fîm kir ku yê giliya wê kirine Hecî Xêredin û Nezaket Xanim in. Hecî bi bedl û qrewata xwe li pêşberî wê rûnişt û mela Mecoyê Simo da rûyê wê. Ew bi vî karê ji wan re kirî tawanbar dikirin. Rehîmeya bêhileta (bê teqet) di bin işken-cê de perîşan birîndar, hinekî xwe bi-lind kir û heya jê hat liçike mezin a ti-fî avête nav çavên wî û qîriya:

– Haciye xinize bêşeref, dawiya we-nêzik e.

Rehîme tewqîf kirin, birin Zindana Amedê. Heya niha li wir radizê.

Hejmara 18'an a Nûdemê

Kovara hunerî, edebî û çandî Nûdem ku li Swêdê ji 3 mehan carekê tê weşandin bi hejmara xwe ya 18'an derket pêşberî xwendevanê zimanê kurdî.

Ev kovara ku di bin berpirsiya Firat Cewerî de derdikeye, ji aliye naverokê ve bi nivîsen li ser şaxen cur bi cur ên çand û hunevê dagirtî ye. Di vê hejmarê de ev nivîs cih digirin: Bi Ferhat Shakely re hevpeyvîn, nivîsa Naci Kutlay a der barê romana kurdî de, nivîseke Xelîl Duhokî li ser helbestvan Refiq Sabir, hevpeyvînek bi helbestvanê tirk Arif Damar re, çirokek ji pênuşa Şahînê Bekirê Soreklî, çirokeke Sidiq Hirorî, li ser J.J. Rousseau nivîseke Felat Dilgeş, nivîsa Şefrxan Cizîrî ya li ser Jîmenîgariya Cegerx-

NÛDEM

No 18 1996



Kovara Huneri, Edebi û Çandî

wîn û nivîsa Mihemed Dehsiar a li ser Martin Luther King.

Dîsa, Süleyman Demir, Rojen Barnas û Beyhanî Şahîn bi helbesten xwe, Konê Reş bi hevpeyvîna di gel Seyda Tîrêj û Bûbe Eser bi piyeke kurt di vê hejmara Nûdemê de besdarî kirine. Her wiha Berpirs û Xwedîyê Nûdemê Firat Cewerî çend helbest ji helbestvanen navdar ên swêdî wergerandine zimanê kurdî.

Li vir ez dixwazim hinekî li ser hevpeyvîna ku di gel Ferhat Shakely hatiye kirin, rawestim. Lewre nêrîna Shakely a der barê helbesta kevnare ya kurdî de û bi taybetî ji gotinê ên li ser Ehmedê Xanî, Mem û Zînê gelekî balkes in. Li gorî Shakely Mem û Zîn bi terza mesnewiyê hatiye nivîsin. Ew idia dike ku anca % 5'ê rewşenbîren kurd ji Ehmedê Xanî û Mem û Zînê baş fêm kirine, gelek kesî ji ew li gorî bîr û baweriyen xwe şirove kirine.

Her wiha Shakely dide zanîn ku, kurdan 300 saliya nivîsandina Mem û Zînê ji çewti pîroz kirine. Sedema vê çewtiyê ji ji ber ferqa mîladî û hîcrî ye. Heke mirov mîjûya jidayikbûna Ehmedê Xanî ji hîcrî (1061) bizivîne ser hesabê mîladî (1651) û 44 salî lê zêde bike (ji ber ku wî Mem û Zîn di 44 saliya xwe de qedandiye), mîjûya qedandina wê dibe 1695. Li gorî vî hesabî 300 saliya pirtûkê dibe 1995. Lî dema mirov 44 salî li 1061'ê zêde bike, pişt re bizivîne ser mîladî mîjûya nivîsandinê dibe 1693 û heke mirov 300 saliya pirtûkê li gorî hîcrî hesab bike, paşê bike mîladî, îcar 1405 derdikeye, ku beramberî 1984'ê mîladî ye. Divê wêjenasen kurd bi baldarî li ser vê mijarê rawestin da ku çewtiyên bi vî rengî çenebin.


Bi kurmancî

Mizgîniya Îsa Mesîh

Tevi weşanxaneyen kurdan ku zora gelekk astengiyen aborî û siyasî dibin û weşanen kurdî derdixin, derdoren derveyî kurdan ji weşanen bi zimanê kurdan dikin. Kitab-ı Mukaddes Şirketi ango Şirketa Pirtûka Pîroz yek ji van derdoren li derveyî kurdan e. Vê şirketê pirtûka pîroz a isewiyan İncil bi navê Mizgîni li zimanê kurdî daye wergerandin. Ew "Mizgîniya Îsa Mesîh li gorî Lûqa" ji aliye heyetekê ve hatiye wergerandin. Li gorî agahiyen ku di pêşgotinê de cih digirin, ew heyet wê hin pirtûkîn din ên ola xiristian ji wergerine. Derketina pirtûkîn bi vî rengî ku li dora hezar zimanen cîhanê hatiye wergerandin, ji bo rawebûna doza gelê kurd ji girîng e.


Pirtûk li zaravayê kurmancî hatiye wergerandin. Zimanê pirtûkê bi giştî bas e û xuya ye ku bi hûrbîni li ser hatiye rawestin. Lî cûdanivîsandina qertafa neyiniyê ya lêkeran wekî 'ne hatine' û pevnîvîsandina 'hertiş' wekî çend mînakîn xweseriya rastnîvîsa heyetê xuya dikin. Her wiha gotinê wekî "Ji te re hatine hînkîrin" ku wateyeke dûrî daxwaza wergervanan jê dice, tevî giraniya mijarê ji bo insanen kurd ku dixwazin ola Isewî nas bikin, dibin asteng. Di dawiya pirtûkê de ferhengokec cih digire. Di vê ferhengokê de peyy û têgînên ku nayen zanîn tên şirovekirin.

SAMI TAN



Avaşîn

DILBIXWÎN DARA



Avaşîn: Ne tenê gotineke çêkîrî ji du (2) gotinan e. Ew hem navê çemekî ye li bakurê Kurdistanê, hem navê şehîdan e, hem ji rûpelekî nû ye ji berxwedana gelê kurd a modern. Gerîlayen ku Avaşîn dîtine, bi eşq û evîneke mezin, bi saetan dikarin li ser çelengî, zelalbûn û bedewiya Avaşîn biaxivin.

Av: Jiyan bê av nabe, hinek dibêjin av tunebe jiyan nîn e. Pêxemberê mezin Zerdeşt ji gotiye: Ev her çar tişt muqedes in: Av, ba, ax, roj ji ber ku jiyan girêdayî van her çar tiştan e, dema ku tune bin, jiyan tune ye, ji bo vê yekê di jiyanê de av cihekî pîroz distîne.

Şîn: Şînbûn li gorî danasîna oldaran koşeyekî cenetê ye. Cenet bi şînbûna xwe tê naskirin, zaten Kurdistan bi xwe

aliyekî cenetê digire. Ne tenê bi çem û kaniyên xwe, ne tenê bi çiya û zozanen xwe, ew bi hemû hebûna xwe rengekî cenetê ye.

Niha ji Avaşîn, navê kovareke edebî ye. Hejmara wê ya yekemîn di vê biharê de derket. Naveroka kovarê ji hemû kovarênu ku heya niha derketine û derdikeyin cudatir e. Ew bi armanceke mezin, bi idîia û berpirsiyariyeke mezin derdikeye.

Kovar, bi taybetî li ser pirgirêk û problemen edebiyata kurdî disekine. Lî belê bi cesareteke mezin. Ne têne problem û pirsgirêkîn wêjeya kurdî, her wiha kovar derbasî nava edebiyata şoreşê ji dibe û ji şoreşê dîmen û wêneyan ji xwendevanan re pêşkêş dike.

Edebiyat huner e. Şoreş ji şeklekî hunerê ye. Edebiyat û şoreş tu caran ji hev cuda nabin.

Şoreş tune be edebiyata neteweyeke wekî me bindest bêruh dimîne, bêqîmet dimîne ji bo ku em edebiyata xwe bi pêş ve bibin ji gerek e em xwe ji şoreş qut nekin. Weşanen ku bi navê parastina edebiyatê xwe ji şoreş qut dikin û

cesaret nakin ku wêneya gerîlayekî azadiyê di nava rûpelên xwe de biweşînin, ew wêjeya kurdî teng dîkin û di koşeyekî tarî de dihêlin. Ferqa di navbera Avaşîn û kovarênu din de ji ev e.

Di pêşgotinê de ji Avaşîn bi sernîvîsa "... û em dest pê dîkin" edebiyatê wiha dinasîne: "Pirsa edebiyata şoreşgerî, pirsa şerê şoreşgerî ye..." Her du pirs ji girêdayî hev in. Şoreş neteweyeke azad dike. Neteweyeke ne azad ne xwedîyê edebiyateke azad e.

Mirovekî ne azad nikare hunereke azad ji biafirîne. Ji bo afirandina huner û edebiyatê nivîsandina çend gotinan li ser edebiyatê em xwe azad dibînin. Ev ne nêzîkbûneke rast e, nêzîkbûna rast ew e ku mirovê edebiyatzan xwe wekî neferekî şoreş bibîne. Ji ber ku tenê şoreş dikare wî azad bike.

Avaşîn: Xwerû bi kurdî tê weşandin. Wekî guleke sor di gulistaña çand û hunera kurdî de vebûye. Wî bexçeyî dixemilîne.

Hêviya min ji hemû nivîskarênu kurd ew e ku vê gulê av bidin û bi nivîsen xwe Avaşîn dewlemend bikin.

Leşkeriya Kûto

Kûto, ji leşkeriyê vedigere. Cîran û lêzimên wî li dorê dicivin.

Jê re dibêjîn:

– Kûto de ka ji me re behsa leşkeriya xwe bike, Kûto dibêje:

– Wele ma ezê ji we re çi bibêjim. Her sibe em dicivandin.

Em diketin rêzê û me ji serî ve dest bi hejmarê dikir. Her tim ku dora min dihat min, digot: "Yedî" (heft). Roja dawî dîsa min got: "Yedî." Serbaz hat, li min xist.

(Tu nabê ku wê rojê yek kêm ketiye rêzê)

Qaqilê pîvazê

Mele Evdê Dardükli li ser mahserekê dibîne ku qaqilekî pîvazê ketiye teşa dimsa gundiyeckî. Ji gundî re dibêje:

– Ev dimsa te heram bûye.

Gundî dibêje:

– Çima Seyda?

Mele Evdê li ser pirsa gundî dibêje:

– Ev pîvaz di nav axa bi zibil de çêbûye. Ev qaqilê pîvazê heram e, dimsa te jî heram kiriye. Tu vê dimsê rake bibe li mala me deyne. Li vegerê ezê li ser bixwînim.

Gundî dimsê dibe datîne mala mele. Mele ji gundiyan tevan dims berhev kiriye û xistiye denê xwe. Gundiyê me ji radibe qaqilekî pîvazê diavêje hundirê denê mele û vedigere dibêje:


– Seyda qaqilê pîvazê ketiye nav denê dimsa te.

Mele Evdê radibe, diçê qaqilê pîvazê derdixe. Dibêje:

– Bêhişo yê min pelê bin pelê ye. Tu xisara wê tune ye.

BERHEVKAR:

M. BEDRAN BÊNAV



Marlboro ji Bîrîncî erzantir e

Li gundekî Pazarcıka Mereşê xortekî feqîr hebû. Tevî ku rewşa wan a aborî nebaş bû jî, wî xorfi cixara Marlboro dikişand. Bavê wî miribû. Tevî dayika xwe jiyan dibû. Piraniya lêzimên wan çûbûn Ewrûpayê. Pismamên wî havînê ji Ewrûpayê dihatin ziyareta wan. Wî xorfi jî dixwest biçuya Almanyayê, lê rewşa wî ne müsaît bû.

Her dem dayika wî jê re digot:

– Lawo, dev ji vê cixara Marlboro berde, rewşa me ne müsaîte, em feqîrin."

Lê xort bi ya xwe dikir û li diya xwe guhdarî nedikir. Ji ber ku dixwest mîna pismamên xwe jiyan bibe.

Rojekê dîsa diya wî jê re dibêje:

– Dev ji Marlboro berde. Em ne mîna wan zengîn in. Tu li halê me binêr, em di çi rewşê de ne û ew di çi rewşê de ne?

Xort pir bi hêrs radibe ser piya û wisa ji dayika xwe re dibêje:

– Dayê, eger tu pir bi ser min de werî û min aciz bikî, ezê dev Marlboro berdim, dest bi cixara Bîrîncî bikim."

Dayika wî dema dibihîse bîrîncî ji wê ye ku Bîrîncî ji Marlboro bihatire. Bi lez dibêje kurê xwe:

– Na lawê min. Qurbana te me. Marlboroya xwe dom bike. Çawa be Marlboro ji Bîrîncî erzantir e."

HÜSEYİN ATEŞ

XELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (24)

XAÇEPIRSA

| Covrek Tensîk PEK/KE Dîşkî | B | Necayek Bajîvaran | F | Bi censî Kurd Trotzke komputur | E | Gelî | A | Sembola Hüfregem Sikunet | H | Nexweşî xwinê | |
|-------------------------------------|---|----------------------|---|---|---------|------|---|--------------------------------|------|------------------|--|
| Y | A | Ş | A | R | K | P | Y | A | Bang | A | |
| G | A | A | R | A | R | A | R | A | N | | |
| L | O | R | E | M | A | R | A | Z | E | | |
| K | I | L | D | O | T | M | A | M | | | |
| U | S | T | R | H | Ejmarek | T | T | N | T | | |
| E | T | D | A | D | T | L | | | | | |
| A | W | A | Z | U | N | O | | | | | |
| A | N | T | N | K | İ | D | R | | | | |
| A | N | T | I | J | A | D | | | | | |
| PEYVA VEŞARI → R E W F E N | | | | | | | | | | | |


Bersiva Xaçepirsê (22)

Xaçepirsâ me bixelat e.
Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînîn û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin.

Xelata hejmara me ya 24'an kitêba Medenî Ferho "Hey Gerîla"ye.
"Hey Gerîla"ye.
Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarı" di nava qutîyen li bin xaçepirsê de binîvisin û tevî adresâ xwe ji me re bisînnîn.


Kesên ku xelata xaçepirsa 22'an, kasetâ Koma Agirê Jîyan "Adarê" qezenc kirine: A. Menaf Çelebi/D.bakır, Şakir Aydin/Söke, Yemilhan Adıgüzel/İstanbul, Tahir Ertas/Izmir, Yusuf Dündar/Van, A. Kadir Akbulut/İzmir, Mahfuz Sain/İstanbul, İzzet Kaplan/İzmir, Zana Şîl/Batman, Metin Özdemir/İstanbul.



| | | | | | | | | | |
|---------------------------|-----|--------|-----|----------------------|------------|-----|---|---|---------------------------|
| Stranbêjek (Wêne) | ↓ | Rojek | ↓ | Naveki jinan | Gihane-kek | → Ø | Madeyeke kîmewî | ↓ | Nexweşî- neke xwinê |
| Huwiyet | X | Mindal | I | Kesê İndo- ewrûpi | E | Ø | Ev roj | | |
| 10 N | A | S | N | 5 A | M | E | Bi erebi kirin | ↑ | T A |
| Sembola Neonê Osman | N | E | R | O | Z | Ø | Es, azar | ↑ | |
| | S | E | B | R | I | Ø | Ø | Ø | |
| İstixbara- ta tirk | M | I | 8 T | Ø | Ø | Ø | Nixuman- di, veşarı Damezrê- ner | Ø | |
| Darek | M | I | Ø | Ø | Ø | Ø | Ø | Ø | |
| Leb | B | I | Ø | Ø | Ø | Ø | Xulam | Ø | |
| Naveki ermeniyan | | | Ø | Ø | Ø | Ø | Navek | Ø | |
| Yezdanekê misri | 4 B | A | Ø | Ø | Ø | Ø | Niv | | |
| Hidrojen | | | | Ø | Ø | Ø | | | |
| Sewalek | H | Ø | Ø | Ø | Ø | Ø | | | |
| Çiya | | | | Ø | Ø | Ø | | | |
| Kolektiv- izm | | | | Ø | Ø | Ø | | | |
| Rê, rêç | | | | Ø | Ø | Ø | | | |
| Sebir | S | Ø | R | Ø | Ø | Ø | | | |

PEYVA VEŞARI → 1 M 2 E 3 Z 4 R 5 A 6 B 7 Ø 8 T 9 A 10 N





Astoya
WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayincılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedi (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

Gerfinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMI BATUR

Berpirsê Karêن
Nivisaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpirsê Saziyê
(Müessesesi Müdürü)
TAHIR ELEDIMİR

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212) 293 53 19,
251 90 13
ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.
BELAVKIRIN
Birleşik Basın Dağıtım
(BBD)

NÜNERİTYÎYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimnendeyê Giştî
yê Ewrûpayê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost,
Helim Yûsiv

Berlin:

Silêman Sido
49-30-69002695

Hannover:

Selîm Biçük
49-5721-81360

Munchen:

Mahmut Gergerli
49-871-670884

Brukسل:

Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm:

Robîn Rewsen
46-8-7510564

Bonn:

Ahmet Baraçlıç
49 228 66 62 49

Hollanda:

Remzi İlhan
312 06 32 31 28

Celle:

Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Berî baranê ba û berî mirinê ta ye

Ev bû zêdeyî heftê salî ku komara tirkîyeyê hatiye damezirandin. Di nav vê demê de, artêşa tirk ji kurdan pê ve li dijî tu dijminî nehatiye bikaranîn, tim û tim ji bo pelçiqandina serhilçanên kurdan û ji bo qirkirina gelê kurd hatiye bikaranîn.

Ji ber têkoşin û berxwedana gelê kurd car caran dewleta tirk bêhêz dima û dîkete tengasiyan.

Lê disa bi qeweta xwe ye leşkerî û hêzên tarî û bi fen û fûtan xwe ji van tengasiyan derdixist û bêhnek vedida, lê her ku dem derbas dibû, gelê kurd jî dijminê xwe hê baştir nas dikir û her car bi hêztir serî hildida û berxwedana xwe di-domand.

Ev serhilden û berxwedan çiqas bi ser neketibe jî, lê ew ruhê têkoşin û berxwedanê di nava dilê gelê kurd de dihat çandin û xurtir dibû, gestir dibû.

Ev rewşa ha bi vî rengî didomiya, kurdan serî hildida û dewleta tirk jî bi wahşet û hovîtiyeke mezin ew dipelçi-qandin, hetanî şoreşa mezin, şerê serx-

Dewleta tirk jî di vê rewşê de ye. Dewletên kolonyalist çiqas piştgiriyyê didinê, dibêjin "Tu baş dicî, rewşa te baş e, hindik maye tuyê kurdan biqedînî û tuyê rehet bibî", lê ew êş ji laşê wê dernakeve, birîna wê hê xedar dibe.

Qudûmê wê nema digere.

webûn û azadiyê ku di 15'ê gelawêjê de guleya yekemîn avêt dilê dijmin û dijmin roj bi roj xwîn winda dike.

Gava mirovokî nexweş rewşa wî gi-ran dibe û kifş dibe ku wê bimire, kesen ku tên serdana wî ji bo moral û dilxwes-bûne bidinê, jê re dibêjin:

"Tu pir baş i tiştekî te nîn e, xwe net-tirsîne". Bi înşeleh û maşelehê, wî dixa-pînin. Mirovê nexweş baweriya wî tê û dibêje qey bi rastî tiştekî wî nîn e, lê dîsa dibîne ku ew êş û elem di nava wî de ye, derneketiye.

Dewleta tirk jî di vê rewşê de ye, dewletên kolonyalist çiqas alîkarî û pişt-giriya xwe didine wê, dibêjin:

"Tu baş dicî, rewşa te baş e, hindik maye tuyê kurdan biqedînî û tuyê rehet bibî", lê çiqas dibêjin jî ew êş ji laşê wê

dernakeve, birîna wê hê xedar dibe û rewşa wê ber bi xerabûnê ve diçe qudû-mê wê nema digere. Ji ber vê êş û elemê vêca bi tepe li xwe dide.

Wekî ku iro em dibînin bê çawa hemû rayedarên dewleta tirk ketine nava hev, hev û du didirin. Hilbijartînê li ser hilbijartînê çedîkin, nabe: Koalisyonê li ser koalisyonê ava dikin nameşe, her tiş teqiniye nameşe, vêga bi tepe li xwe didin.

Êdî taya mirinê bi qirika wan girtiye ji mirinê pêve li pêsiya wan tiştek nemaye, wekî ku pêsiyê me gotine: "Berî baranê ba ye û berî mirinê jî ta ye", êdî di sekeratê de ne, bi erebî "elfatîha."

REMEZANÊ HÛRÎ

YA TELEVİZYONÊ....BERNAMEYA HEFTEYÎ YA TELEVİZYONÊ..... BER

YEŞEM

30.06.1996
17.45: Vebûn
17.50: Nûbihar
18.35: Çend dîmen ji
Kurdistanê
19.00: Nûçe
19.20: Serçavan
20.15: Nûçeyen tirkî
20.35: Forum
00.15: Nûçe

DUŞEM

01.07.1996
17.45: Vebûn
17.50: Nûbihar
18.35: Arkeolojî
19.00: Nûçe
19.20: Vengûvaz

20.15: Nûçeyen tirkî
20.35: Belgesel 2
(Selahattin Çelik)

21.30: Nûçeyen soranî
21.40: Sêla Sor
22.30: Kenê Reş
23.00: Bûyerên
Navneteweyî
23.15: Jiyana gel
00.00: Muzik
00.15: Nûçe

SÊŞEM

02.07.1996
17.45: Vebûn
17.50: Nûbihar
18.35: Tîrêj
19.00: Nûçe
19.20: Ciwan

20.15: Nûçeyen tirkî
20.35: Rêze Film:
Anna Frank-2 (Dawî)

21.30: Nûçeyen soranî
21.30: Belgesel:
Qetflama Sêwazê
22.40: Zimanê Huner
00.15: Nûçe

ÇARŞEM

03.07.1996
17.45: Vebûn
17.50: Nûbihar
18.35: Mirov û xweza
19.00: Nûçe

19.20: Gelawêj

20.15: Nûçeyen tirkî
20.35: Hêvî û
daxwazîyên gel
21.30: Nûçeyen soranî
21.40: Hêvî û
daxwazîyên gel
(dûmahîk)

PÊNCSEM

04.07.1996
17.45: Vebûn
17.50: Nûbihar
18.35: Mirov û xweza
19.00: Nûçe

18.35: Muzik
18.45: Çapemeniya

19.00: Nûçe
19.20: Bernameya
erebî
20.15: Nûçeyen tirkî
20.35: Koçberî
21.00: Muzik
21.30: Nûçeyen soranî
21.40: Hawarî Roşinbirî
22.30: Warê Jêlê
23.20: Kurdên
Kazakistanê (2)
00.15: Nûçe

ÎN

05.07.1996
17.45: Vebûn
17.50: Nûbihar

18.35: Xutba olî
18.40: Klîp

19.00: Nûçe
19.20: Med Dokument
Kurdistana Rojhilat
20.15: Nûçeyen tirkî
20.35: Kursiya gel
21.30: Nûçeyen soranî
21.40: Kursiya gel
(dûmahîk)
00.15: Nûçe

ŞEMÎ

06.07.1996
17.45: Vebûn
17.50: Nûbihar
19.00: Nûçe
19.20: Welatê rojê
20.15: Nûçeyen tirkî
20.35: Şox û Şeng
00.15: Nûçe



20.15: Nûçeyen tirkî
20.35: Rêze Film:
Anna Frank-2 (Dawî)

21.30: Nûçeyen soranî
21.30: Belgesel:
Qetflama Sêwazê
22.40: Zimanê Huner
00.15: Nûçe

ÇARŞEM

03.07.1996
17.45: Vebûn
17.50: Nûbihar
18.35: Mirov û xweza
19.00: Nûçe

19.20: Gelawêj

20.15: Nûçeyen tirkî
20.35: Hêvî û
daxwazîyên gel
21.30: Nûçeyen soranî
21.40: Hêvî û
daxwazîyên gel
(dûmahîk)

PÊNCSEM

04.07.1996
17.45: Vebûn
17.50: Nûbihar
18.35: Mirov û xweza
19.00: Nûçe

ÎN

05.07.1996
17.45: Vebûn
17.50: Nûbihar

Sason: Warekî dîrokî û di bin çepera ciyan de

Navçeya Sasonê di bin çepera ciyayên li bakurê
 Elîhê (Batman) de dikeve. Li Bakurê wê Mûş,
 li Rojhilata wê Bedlîs, li Rojavayê wê Amed û li
 Başûrê wê jî Hezo heye. Aqara Sasonê 716 km² ye.
 Bilindahiya wê 980 metro ye. Çend ciyayên wê bi navê
 Meleto, Zavaser, Helekiz, Gemêşor û Sintore hene.

Sason yek ji wan cih û wargehê Kurdistanê ye ku dema mirov bajar û navçeyên herêmê pê re qiyas dike, şaristaniyeke gelek kevn û dîrokî tê pêş çavên mirov. Beriya Zayına İsa (BZ) di salên 1400'an de mirov dibîne ku di hakimiyeta Urartuyan de navê Sasonê derbas dibe. Piştî hakimiyeta Urartuyan demeke dirêj Sason di bin hakimiyeta Babil û asuran de dimîne. Dîsa beriya Zayına İsa di salên 635–584'an de herêma Sasonê dikeve bin destê İskîten ku ji Qefqasan hatine. Di wan sedsalan de medî û persiyan hikum li ser Sasonê kirine. Dema İskenderê Mezin Anatolisiyê bi dest dixe, Sasonê jî bi erdê xwe ve girê dide. Gava İmparatoriya Bîzansê pêl bi pêl fireh

dibe, carinan Sason jî dikeve bin destê wan. Li gorî hinek çavkaniyên dîrokî, herêma ku dikeve navbera Dicle û Gölla Wanê hin mirityen bi navê "Karduk, Kortu, Kortik, Ardovar, Motogan û Balçaxan" hatine avakirin. Di dema Hz. Ömer de ku wê çaxê destpêka İslamiyetê bû, piştî Zayına İsa di sala 639'an de Sason dikeve bin destê ereban. Wê çaxê jî, ji Basrayê hin eşîrên ereban anîne û bi awayekî koçberî jiyanâ wan bi wan dane derbaskirin. Pişt re dagirkeriya tirk, ereb û bîzansan dest pê dike. Di sala 1071'an, di şerê Melazgirê de herêm dikeve bin destê tirkân selçûqî. Pişt re herêm dem bi dem dikeve bin hakimiyeta karakoyunluyan, akkoyunluyan, İlhanîyan û moxoliyan. Lê belê di sala 1507'an de hakimiyeta sefeviyan, dest pê dike. Di salên 1514–1515'an de di Şerê Çaldiranê de di dema Yavuz Sultan Selîm de dagirkeriya dewleta Osmaniyan dest pê dike. Dîrokzanê kurd Şerefxan di berhemâ xwe ya navdar Şerefnameyê de di rûpelên 217–236'an de ji mîrîtiya Sasonê behs dike û dinivîsîne ku mîrîti di sala 1521'an de ji hêla Kanûnî Sultan Süleyman ve ji Süleyman Beg re hatiye diyarkirin. Di sala 1864'an de dema di şûna eyaletan de wilayet têne avakirin Sason bi ser Diyarbekirê ve tê berdan. Di sala 1871'an de di "Salnameya Diyarbekir"ê de tê di-

mîrîtiya sefeviyan, dest pê dike. Di salên 1514–1515'an de di Şerê Çaldiranê de di dema Yavuz Sultan Selîm de dagirkeriya dewleta Osmaniyan dest pê dike. Dîrokzanê kurd Şerefxan di berhemâ xwe ya navdar Şerefnameyê de di rûpelên 217–236'an de ji mîrîtiya Sasonê behs dike û dinivîsîne ku mîrîti di sala 1521'an de ji hêla Kanûnî Sultan Süleyman ve ji Süleyman Beg re hatiye diyarkirin. Di sala 1864'an de dema di şûna eyaletan de wilayet têne avakirin Sason bi ser Diyarbekirê ve tê berdan. Di sala 1871'an de di "Salnameya Diyarbekir"ê de tê di-

yarkirin ku Sason bi sencaqa Sertê ve hatiye girêdan.

Cografyaya Sasonê

Navçeya Sasonê di bin çepera ciyayên li bakurê Elîhê (Batman) de dikeve. Li Bakurê wê Mûş, li Rojhilata wê Bedlîs, li Rojavayê wê Amed û li Başûrê wê jî Hezo heye. Aqara Sasonê 716 km² ye. Bilindahiya wê 980 metro ye. Çend ciyayên wê bi navê Meleto, Zavaser, Helekiz, Gemêşor û Sintore hene.

Çend berhemên dîrokî

Heta vê gavê ji nîvîsên ku der bare Sasonê de hatine weşandin tê fêmkirin ku, ew der xwedîyê dîrokeke kûr e. Lê mixabin li gorî vê dîroka kevn jî berhemên dîrokî baş nehatine parastin, ji ber-

vê yekê jî berhemên bi vî rengî kêm in. Sedema vê ya herî mezin jî ev e ku taybetiya wargeha Sasonê ciyayibûna wê ye. Li gorî agahiyen di destan de, li rojhilatê gundê "Gundênu" û "Kela Pertukan", li gundê Bozikan "Kela Bozikan" û li Çiyayê Meydanê ku ji bajê 7 km dûr e jî "Kela Beksi" yê heye.

Li Rojhilata gundê Dahlik li ser çemê Sasonê, pirekê yek kemer û kurt heye. Lê belê nayê zanîn ku ev pir ji hêla kê ve hatiye çekirin. Di hin riwayetan de tê diyarkirin ku ev pir di dema çekirina pira Malabadê de ku ji hêla artuqian ve hatiye çekirin di eynî demê de hatiye avakirin. Li hêla din li mezreya Komikê "Dêra Komik"ê ji bi nav û deng e. Her wiha li ser ciyayê Meleto jî manastireke xerabe heye.

SALIHÊ KEVIRBİRİ

